



Mistefa Hicrî:

PDKÎ, BI HEMÛ PIRENSÎPÊN DEMOKRATÎK PÊBEND E

► Bi hilkevta Cejna
25'ê Gelawêja
1388 (16'ê Tebaxa
2009)an, 64'mîn
salvegera
damezrandina
PDKÎ, şahî,
semînar û rê û
resm û çalakiyên
berfireh li piraniya
gund û bajarên
Kurdistanê Îranê,
Binkeyên PDKÎ û
çendîn welatên
Ewropa, Amerîka,
Kanada, Ustraliya
birêve çûn.

Di binkeya
Deftera Siyasî ya
PDKÎ li bajarê
Koyê, rê û resmekî
taybet û berfireh



hat liarxistin. Di şahiyê de Sekreterê Giştî yê PDKÎ, Mistefa Hicrî peyamek giring û balkêş pêşkêş kir û li ser pêwîstiya
dîrokî a avabûna PDKÎ, xebat û tekoşîna wê partiyê di 63 salên borî û astengên ser rêya xebata PDKÎ axivî. Herwiha
Mistefa Hicrî bal kişande ser rêbaza demokratîk û pêbendbûna PDKÎ bi hemû pîrensîpên demokratîk û stratejiyên PDKÎ di
rêya cihgirkirina demokrasî di Îranê de û dabînkirina mafê neteweyî bo gelê Kurd di Rojhilatê Kurdistanê de.

Deqa peyama Sekreterê Giştî yê PDKÎ, Mistefa Hicrî, di Paşkoya taybet a vê hejmara Agirî de bixwînin...

**Pirsa Kurd
Pirsgirêka Herî
Giring Ya
Türkiyê...**

5



**Dîrok û Curên
Femînîzmê**

7



**PARASTINA
XWEZAYÊ**

9



Daxuyaniya PDKÎ Di 30'mîn Salvegera Derkirina Biryara Cîhada Xomeynî Li Dijî Xelkê Kurdistanê

H ewelatîyên hêja!
Xelkê xebatkar û azadîxwaz yê Kurdistanê!

Civat û komeleyên mirovhez!

Netewa Kurd û partiya wê a pêşeng, anku Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê ku di xebata dijî rejîma Paşayetiye de derbazbûyîyek dûr û dirêj û teji ji şanazî û serbilindî heye û di pêxema pêşvebirina vê xebatê de, gellek gorî daye. Herwiha di pêvajoya şoreşa netewên Îranê de jî pirr ektîv û çalak bûye û di refa herî pêş a vê xebata de, bi hêviya damezrandina sistemek demokratîk li Îranê xebat kiriye. Sistemêk ku tê de xelkê seranserê Îranê bi azadî û demokrasiyê û netewa Kurd jî bi mafên xwe ên berheq şa be. Destkevta encama vê xebatê, rûxana rejîma dijî gelî û dijî azadî a Mihemedrizza Şah di 22'ê Rêbendana sala 1357'an a Rojî de, bû.

Piştî huloşandina rejîma Paşayetiye li Îranê, gelê Kurd hêvîdar bû ku bigihe mafên xwe ên rewa. Lê rejîma Komara Îslamî a Îranê ku teze gihîştibû dethilatê, dest bi pîlandarêtin li dijî netewa Kurd kir û her di destpêka Newroza sala 1358'an a Rojî(1980) de, li bajarê Sine şerek bixwîn bi ser xelkê vê bajarê de sepand ku di wî şerî de bi sedan kes ji xelkê bêsûc û sivil ji aliyê hêzên rejîma Komara Îslamî a Îranê ve hatin kuştin û midehek zêde bi ser de neçû ku wê rejîmê di 31'ê Xakelêweya hemem salê de şerê Nexede saz kir.

Partiya Demokrat bi rêkirina çendîn şandan ji bo Tehranê bona gotûbêjîkirin tevî karbidestên wê demê ên Tehranê, ji Xomeynî ve bigire heya ku digiye Bazirgan û Benîsêdr û... gellek hewl da ku bikare ji rêya aşîxwazane ve û dûr ji şer û xwînrejiyê, daxwazên netewa Kurd bixe rojevê û raya karbidestên rejîmê ber bi wê pirsê rabikîşîne û bi hêviya çareserîkirina pirsgrêka han pirr hewl da. Lê mixabin rejîma Îranê li cihê avêtina gavên pozetîv û aşîxwazane bona çareserîkirina pirsê Kurd, diholra şer îxist û di roja 28'ê Gelawêja sala 1358'an(16ê Tebaxa 1980) de, Xomeynî bi dana fermana cîhadê li dijî netewa Kurd û bi helalzanîna can û mal û namûsa netewa azadîxwaz û mafxwaz, şereke neberamber û nexwastî bi ser gelê Kurd da sepandin ku heya niha jî di şewazên cur bi cur de dom dike.

Xomeynî di fermana xwe de ku bi hêcet şerê Pawe der kiribû, lê di rastî de li dijî hemû gelê Kurd fermana han dabû, biryar da giştî hêz û çekdarên rejîmê ber bi Kurdistanê bimeşin. Di fermana han de tepeserîkirina netewa Kurd bi erkek pîroz û gellek girîngtir ji nimêj û rojiyan hesabandibû û PDKÎ jî bi partiyek helweşiyayî(illegal) ragihand. Di çarçoveya wê fermanê de bû ku hêzên mirovkuj û nezan ên rejîma Xomeynî êrîş kirin ser



xelkê bêsûc û mafxwaz ê Kurdistanê. Hêz û kirêgirtiyên rejîma Îranê li jêr serpereştiya Çemran û kesên wek Xelxalî, dest dane kuştin û qirkirina netewa Kurd û ji tu kiryarêkî nemirovî xwe neparastin. Di çarçoveya vê fermanê de bi sedan ciwanên sivil û bêtawan ên Kurd piştî dadgehîkirinê çend deqîqeyî ên Xelxalî hatin îdamkirin. Pasav û hêceta Xelxalî bo kiryarên han ên nemirovane ew bû ku digot: "Emê wan îdam bikin, ger ew bê tawan bin, dê herine biheştê, lê ger tawanbar jî bin ew gihîştine cezayê xwe".

Xelkê xebatkar ên Kurdistanê!

Di zirofek wiha de ku bi ser Kurdistanê hatibû sepandin, xelkê Kurdistanê û partiyên xebatkar û azadîxwaz diviya van teslîmê cinayetên rejîma Îranê biban û gişt kiryarên rejîmê qebûl kiriban, yan jî biryara berengariyê li dijî rejîmê daban. Bi xweşî ve xelkê çavnetirs û azadîxwaz yê Kurdistanê bi rêberiya partiyên siyasî û pêşiya hemûyan PDKÎ, rêya duyem, anku rêya berengariyê hilbijartin. Partiya Demokrat di daxuyaniyekê de ji bo hizr û raya giştî a Îran û Kurdistanê, serbarê rohnkirina armanca vê fermanê, îlan kir ku li hember êrîşa han a nemirovane û hovane a rejîma Îranê ku bi armanca qetilkirina xelkê Kurdistanê ye, ne tenê teslîm nabe, belku dest dide berxwedanê. Bi vî awayî şerê berengariyê li dijî hêzên êrîşker dest pê kir. Piştî sê mehan berxwedana netirsane a hêza Pêşmerge û lêdana dehan derbeyên mezin û bi bandor li rejîma Îranê, ku di pêvajoya xebata xelkê Kurdistanê de bi xebata "sê mange" hatiye nasîn, Xomeynî bi awayekî rûyekî bona aşîyê tevî xelkê Kurdistanê û di bingeh de bo rêxistina hêzên xwe û dorpeçkirina hêza Pêşmerge Kurdistanê, peyama 26'ê Xezelwerê ji xelkê Kurdistanê re şand. Di wê peyamê de îşare bi vê yekê hatibû kirin ku nehez û neyaran xirab ew têgihandibûn û ew amade ye ku ji rêya gotûbêjî û bi şewazekî aşîxwazane ve pirsê Kurd çareser bike. Partiya Demokrat tevî partiyên din ên Kurdistanî amadebûna xwe bona gotûbêjîkirin û çareserîkirina pirsê Kurd ji rêya aşîxwazane ve ragihandin. Di

rastî de roja 26'ê Xezelwerê roja serkevîna berengariya xelkê Kurd û îtirafkirina rasterast a rejîma Îranê derheq têkçûna hêzên wê bû. Lewra ger roja 28'ê Gelawêjê, weke roja êrîşkirina hêzên rejîma Îranê bo ser xelkê Kurdistanê bi rojekî girîng û destpêka xebata berxwedan û parastina xelkê Kurdistanê bê hesabandin, roja 26'ê Xezelwerê jî roja bi çokdehatina hêzên rejîmê û serkevîna wê xebatê ye. Lewra ew roj weke rojekî girîng û dîrokî di dîroka xebata mafxwazane a gelê Kurd de tê nasîn.

Xelkê mafxwaz û azadîxwaz yê Kurdistanê!

28'ê Gelawêja îsal, 30 sal bi ser dana fermana cîhada Xomeynî li dijî xelkê Kurdistanê derbaz dibe. Bi dirêjahiya van 30 salan de, gelê me di xebatekî rewa de gellek ezmûnên binirxî di pêxema pêşxistina xebata azadîxwazane de bidest xistiye. Ew ezmûnane bi bihaya şehîdbûna dehan hezar kes ji xelkê Kurdistanê û zîndanîbûn û koçerbûna hezaran xebatkarên din ên neteweya Kurd hatiye bidestxistin.

Ew girtiyên ku tûşî dehan cure îşkencên cismî û rohî hatine û heta piştî kutabûna hukma cezayê û derketin ji zîndanê jî, bandora îşkenceyên han hêj li ser wan tê xuyakirin. Bi dehan hezar kes ji xelkê Kurdistanê mal û welatê xwe bi cî hîştine û dûr ji kes û karên xwe û di welatek xerîb û bê îmkanat de dijîn. Lê her wek Dr. Qasimlo, rêberê herdem zindî yê gelê Kurd dibêje: "Gelek ku azadiyê bixwaze divê nirxa wê azadiyê jî bide". Netewa Kurd jî bi fîdakarî ve nirxên wê azadiyê daye û dîsan amade ye ku di rêya bidestveanîna maf û azadiyên xwe fîdakarîyê bike û nirxan bide.

Ger di 28'ê Gelawêja sala 1358'an de, hêzên xebatkar ên Kurd bona berevanîkirin ji welatê xwe dest dan çekê û di meydana xebatê de kêrhatibûna xwe nîşanî xelkê Kurdistanê dan û bi dehan ezmûn ji netirsî û qehremanîyê tomar kirin. Di 5 salên derbazbûyî de jî di salroja şehîdbûna Dr. Qasimlo de û li ser bangewaza PDKÎ, xelkê Kurdistanê bi daxistina dukan û bazarên xwe û bi temiranidina çirayên malên xwe û encamdana dehan cure çalakî û nerazîbûnên din, wek mes û nerazîbûnên mamostayan, jinan, kasibkarên ser sînor û... awayek din ji xebatê dest pê kirine û di meydana xebatê de jî çeleng û ektîv in û hejmarek zêdetir ji xelkê di vê xebatê de beşdar in.

Rejîma Komara Îslamî a Îranê ku heya niha nekariye xelkê Kurdistanê bi çok de bîne, her rojê bona lawazkirin û jînavbirina xebata gelê Kurd dest dide pîlanek nû. Lê bi keyfxweşî ve ji ber hişyarbûna xelkê Kurdistanê, kompo û pîlanên rejîmê yek li pey yek tîn pûç û betalkirin.

Xelkê xwedîşeref û mafxwaz yê Kurdistanê!

Ger 30 salan berî niha tenê xelkê Kurdistanê rejîma Îslamî a Îranê nas kiriba û li dijî wê xebat dikir, îro rojê rastiya rejîmê ne tenê ji bo gişt xelkê Îranê belku ji bo civata mirovahiye jî eşkere bûye.

Bûyera herî dawî ku hewce ye îşare pê were kirin, şanoya hilbijartina dewra dehem a Serok Komariyê di Îranê de bû ku ev hilbijartin ji aliyê PDKÎ ve bi egera nedemokratîkbûnê, hate baykotkirin û vê partiyê ragihand ku rejîma Îranê kesê xwe bo serokkomariyê destnîşan kiriye. Lewra beşdarîkirin di vê hilbijartinê de bê wate û bê biha ye.

Piştî ragihandina encamên dehemîn gera şanoya hilbijartina Serok Komariyê ku nêzik du mehan berî niha birve çû, pêleke nerazîbûnê ji aliyê xelkê Îranê ve dest pê kir û bi milyonan kes ji xelkê Îranê li dijî rejîma Îslamî hatin ser xiyevanan û banga nerazîbûnê û bêzariya xwe gihandine guhê hemû xelkê cîhanê.

Hevwelatîyê birêz!

Niha piştî derbazbûna 30 salan bi ser temenê rejîma Komara Îslamî a Îranê û dana fermana cîhadê û encamdana dehan pîlanên din li dijî netewa Kurd, bi xweşî ve xebata gelê me hem di asta navxwe de û hem di asta navnetewî de bi awayekî baş ber bi pêşve çûye û rûyê rastî yê rejîma Komara Îslamî a Îranê roj bi roj li ber çavê xelkê Îran û cîhan û kom û civatên navnetewî zêdetir eşkere dibe. Rejîma Îranê rojane tevî kirizên cur bi cur berbirû



dibe û bona çareserkirina van hemû kiriz û pirsgrêkan tenê rêyek ku penaha xwe jêre biriye û dibe, tepeserkirin, kuştin, zindankirin û îşkencekirina hovane a xelkê azadîxwaz û mafxwaz e.

Riftar û bîrkirina han a rejîmê her bi xwe pêkhênerê mezintirîn kirizan e. Lewra em di 30'mîn salvegera derkirina fermana hovana a cîhadê ji aliyê rejîma Komara Îslamî a Îranê derheq netewa azadîxwaz ya Kurd, gişt kiryar û pîlanên din ên rejîmê bona tepeserkirina azadîxwazan li seranserê Îranê mehkûm dikin û hevxiyaya xwe tevî malbatên şehîdên van bûyeran xuya dikin û piştevaniya xwe ji xebata sîvil a xelkê Îranê

bi armanca bidestxistina azadî, demokrasî û mafên netewî, dikin. Em bêguman in ku xwîna bi neheq rijandî a xebatkarên Kurd û êş û azara hezaran kes ji keç û xortên xebatkar ên Kurd heder naçe û aqibet rejîma Komara Îslamî a Îranê mehkûm bi namanê ye.

Bihilose rejîma Komara Îslamî a Îranê Serkeve xebata azadîxwazane a gelên Îranê li dijî zilm û diktatoriye

Partiya Demokrat a Kurdistan a Îranê
Deftera Siyasî
27.05.1388
19.08.2009

64 Sal Xebata Berdewam, Nîşaneyê Mikumiya PDKÎ Ye Li Ser Domandina Doza Gel



Sadiq Eskerî

64 salan berî niha di demekê de ku ne tenê Kurdistan û gelê Kurd û Netewên din ên Îranê, belku gişt Rojhilata Navîn ji dest sîstem, hizr û

raman û desthilatên diktator û paremayî bêzar bibûn û dinalandin, di roja 25'ê Gelawêja sala 1324'an a Rojî de, (16ê Tebaxa 1945) Partiya Demokrat a Kurdistan a Îranê bi destê Pêşewa Qazî Mihemed, rêber û pêşengê navdar û Serok Komarê Kurdistanê û hejmarek ji heval û hevçeperên wî û li ser bingehên rêxistinî ên Komeleya Vejiyana Kurd (J K) li Mehabadê hate avakirin.

Digel avabûna PDKÎ di dîroka netewa bindest û hejar a Kurd de yekemîn sazî û partiya Kurdî a modern û nûjen hate damezrandin û bizava azadîxwazane a gelê kurd jî di çarçoveya tevgerên eşîrî, herêmî û malbatî de derket û bo bizavekî netewî ku xwediyê armancên diyarkirî û pîrensîp û bernameyên taybet bi xwe bû, guhert.

PDKÎ bi avabûna xwe bi awayekî zanistî û piratîkî tevgera rizgarîxwazane a netewa me xiste nava qonaxek nû û pêşkevî de.

Partiya Demokrat bidesvetanîna mafên netewî di warên siyasî, çandî, aborî û civakî de kire armancên xebata xwe. Herwiha dabînkirina demokrasî di gişt Îranê de û ji navbirina zilm û bêdadiyê li ser gelên derdor û cîran û nemana ferq û cudahiye di navbera tev çîn û qatên civakê bi taybetî di navbera jin û mêran de kire armancên herî bingehîn ên xwe û di vê pêxemê de kete hewl û xebatê.

Avabûna yekemîn Komara Kurdistanê di sala 1946'an de, ji aliyê PDKÎ ve û cihgirbûna demokrasî û aşî di herêmên bin desthilata Komara Kurdistanê de, hevkarîkirin tevî gelên derdorê bona rizgarbûn ji dest zilm û bêdadiyê, damezirandina Yekîtiya Jinan û Yekîtiya Ciwanan, rastiya ve çendê dide selimandin.

PDKÎ her di yekemîn rojên avabûna xwe de baweriya xwe bi xwestek û armancên pêşkevî ên gelê me daye îsbatkirin û ji bo bidestxistina wan, bi kiryar hewl daye û tekoşin kiriye. Tekoşînek ku serbarê hebûna wan hemû evraz û nişvan, ew hemû îxanet û xwefiroşî derheq Partiya Demokrat, hêj dom dîke û ji çiyayên Kurdistanê qahîmtir sekiniye, ji kaniyên Kurdistanê zelaltir dimeşe, ji nihalên Kurdistanê kurtûr difikire û ji rûbarên Kurdistanê bi gurtir diherike.

Partiya Demokrat a Kurdistan a Îranê

weke pêşenga tevgera rizgarîxwazane a netewa me di Rojhilatê Kurdistanê de, ku ji aliyê mafxwaz yê Kurdistanê ve tê piştevanîkirin, di heyamê 64 salên derbazbûyî de ne tenê ji xebat di pêxema bidestxistina mafê gelê Kurd de paşgez nebûye, belku ji bo bidestxistina wan xwestek, armanc û mafan, bi tevahî hewl daye û di vê pêxemê de çendî fîdakarî û qurbanî daye. Şehîdbûna dehan hezar ciwanên netewa Kurd di nava heps û zindanan reş û tarî ên her du rejîmên Paşayeti û rejîma Komara Îslamî a Îranê û şehîdbûna hezaran ciwanên Kurd di nava refên PDKÎ û şehîdbûna rêberên wek Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Sadiq Şerefkendî ne cihê înkâr û haşakirinê ne.

Di 64'emîn salvegera avabûna Partiya Demokrat de, silav û rêz û hurmetên xwe ji bo riha gişt wan keç û xortên netewa me ku di heyamê 64 salên derbazbûyî de ji aliyê dujminên gelê Kurd ve hatine şehîdkirin, dişînim û serê rêz û hurmetê ji wan re diçemînin.

64'emîn salvegera damezrandina PDKÎ de, silv û rêz û hurmetan ji bo riha paqij ya gişt wan rêber û kadro û pêşmerge û endamên rêxistinî ên Partiya Demokrat dişînim ku bi rijandina xwîna xwe a sor dara xwezî, xwestik û azadiya gel û welat

Pirsa Kurd Pirsgirêka Herî Giring Ya Turkiyê...



Azad Kurdi

Ev sernivîs gotina çend rojan berî niha a Serok Komarê Tirkîyê, Ebdulah Gul li bajarê Bedlîs a Bakurê Kurdistanê

ye. Daxuyanî û hewl û xebatên yek du hefteyên borî ên karbidestên payebilind yê Tirkîyê li ser giringiya Pirsê Kurd û çareseriyên wê dozê ji rêya aştxwazane û demokratîk ve, ev pirs di 20-30 salên borî de ji her demekê zêdetir xist rojê siyasî a Tirkîyê. Demekî dirêj bû Erdogan daxwaza DTPê bo hevdiin û civînan qebûl nedikir, lê serdan û hevdiin roja 5ê Tebaxa 2009an a Serok Wezîrê Tirkîyê, Receb Teyîb Erdoxan ligel Hevserokên Partiya Cîvaka Demokratîk (DTP) Ehmed Turk û Emîne Ayna dawî bi wê kirîzê û pirsgrêkan anî û hêviyekî nû da pêvajoya çareseriyê siyasîyane a wê pirsê girîng û hestiyar a Komara Tirkîyê ku zêdeyî 80 sal dibe pê re dinale.

Çavdêrên siyasî û siyasethanên Kurd û Turk gavên vê dawiyê ên karbidestên Hikûmeta Dad û Pêşdeçûnê (AKP) û civîna Erdoxan û şanda DTPê û herwiha daxuyanî û helwestên Serok Komar û çend wezîrên dewletê derbarê çareserkirina aştiyane û demokratîk a Pirsê Kurd li Tirkîyê wek guhertineke kûr û mezin di proseya çareseriyê pirsgrêkên navxwe ên wî welatî dizanin û herdu aliyên hikûmet û DTPê jî pêvajoya nû û helwest û gavên dewleta Tirkîyê li dor vê pirsê girîng a Tirkîyê biwêrane, erênî û çihê hêviyê nixandî û vekirina deriyekî nû bi rûyê çareseriyê Pirsê Kurd hesabandin.

Lê ji aliyekî din jî ev daxuyanî û hewl û civînan navbera du aliyên, bi dijberî û helwestên tund ên her du partiyan mezin ên opozîsyona hikûmetê re, anku Partiya Komarîxwaz a Gel (CHP) û Partiya Neteweperest a Gel (MHP) rûbirû bû û wek civîna AKPê û PKKê û wd... binav kirin.

Helwesta van du partiyan zêde di çarçoveya lojîkek şikestxwarî û nejadperestane tê berçav ku di yek du dehsalên borî de li hember Pirsê Kurd ji aliyê wan dihat meşandin, ne rexneyekî pêşgirane li hember proseya çareseriyê an dijberiyek siyasî û mantiqî a partiyek opozîsyonê. Ji ber ku di dewrana desthilatdariya wan û partiyan din de, pirsgrêkên navxwe ên Tirkîyê gelek kûrtir bûn û nerîn û ramana wan înkarkirina pirsê Kurd û nasnameya netewî a neteweyek zêdeyî 25 milyon nifûs li Tirkîyê û herwiha domandina şer bi tevgera mafxwazane a Kurdistanê re di wî parçeyî de bû, niha ku Hikûmeta AKPê di dema van çend salên borî de hin gav û projeyên herçiqas biçûk bin jî, bo çareserkirina Doza Kurd avêtine û

dixwaze çareseriyekî kûrtir jê re peyda bike û lojîkî bi pirsê re tevbigere û pirsê bi rêya aştxwazane û demokratîk û gotûbêjan ve çareser bike, ew du hêz wek berê ketine helwestgirtina nejadperestane û dixwazin mezintirîn pirsgrêka navxwe ya Tirkîyê ku Pirsê Kurd û bînpêkirina mafê mirovan e, bê çareserî bimîne.

Bêguman ev nerîn û gavên ku niha AKPê davêje û tîne rojevê, ger di dema du dehsalên borî de hatiban kirin, Tirkîyê di asta navnetewî de rol û rewşekî cuda ji ya niha dibû. Bi taybet ji bo endambûna Tirkîyê di Yekîtiya Ewropayê de.


Dibe helwest û daxuyanîya herî giring a Serok Komarê Tirkîyê Ebdula Gûl li bajarê Bedlîsê be ku li ser pirsê wiha axivî: "Pirsê Kurd, pirsê herî giring a Tirkîyê ye û pêwîst e ew pirs bi şewazekî siyasîyane û demokratîk bê çareserkirin, ji ber ku ew doza hemû Tirkîyê ye û divê Tirkîyê wek welatekî modern û nûjen wê pirsê girîng a xwe ya navxweyî çareser bike û pêngavan jê re bavêje."

Ketine rojê Pirsê Kurd li Tirkîyê vedigere bo destpêkên dehsala 90 a Zayîni a sedsala borî ku bo yekemîn car jî dîrokzan û ronakbîrê navdar Dr. Ismaîl Beşikçi di teza xwe ya duktorayê de bi awayekî akademîk û realîte Doza Kurd xiste rojê siyasî a Tirkîyê û li ser wê pirsê çend caran cezayên giran ên girtîgehê jî Beşikçi re hat birrîn. Piştê di sala 1993an de, Serok Komarê wê demê yê Tirkîyê ku xwe Kurd dizanî, rastiya hebûna Pirsê Kurd anî rojevê. Lê heta çend salan berî niha jî baskirin ji wê mijarê hêla sor û xeter a Tirkîyê dihat hesabandin. Bi taybet ji bo Arteş, partiyan nejadperest û nasjonalîst ên Turk. Lê gavên van çend salên borî ên Hikûmeta AKPê guhertinek mezin li civaka Tirkîyê û di nav rewşenbîr, siyasethan û medyayan de pêk aniye û fezayekî erênî çêkirîye.

Nemaze vekirina Kanala TRT6ê û destpêkirina xwendin bi zimanê Kurdî di zanîngehên Tirkîyê de û wd, hin gerdûn baş û bicî ji bo xurtbûna nîve demokrasiya Tirkîyê û encama wan hewl û bizavan bû bîngeha destpêkirina pêvajoyekî nû ku di vê mehê de kete rojevê, gellek helwest û daxuyanîyan ku çaverê nedihat kirin zû bîne çîbîçîkirin, derketin holê. Giringiya vê pêvajoya nû di wê yekê de ye ku dawiyê bi proseya bive û qedexebûna baskirin li ser Doza Kurd û bînpêkirina mafê mirovan û mîlîtarîzekirin û bêpariya dever û bajarên Kurdistanê Bakur û pirsgrêkên wan hatiye û tê û ew tilisma dîroka hemdem a Tirkîyê hatiye şikandin û dîwarê înkarkirina dehan salî a wê pirsê rewa ya welatê Tirkîyê jî holê rabû. Wê pêvajoya nû pêwîstî bi cidîyet û kar û mekanîzm û projeyên piratîkî û ron û herwiha domandina gotûbêj û hevdiinan û çareseriyên demokratîk û aştiyane û siyasî heye.

Ligel wê yekê ku Tirkîyê Konvansiyona Mafê Mirovan ya Ewropayê û çendîn peymannameyên din ên navnetewî îmza kiriye, lê hê wî welatî xalên Konvansiyona Ewropî a Parastina Mafê Kêmaniyan nepejirandiye û di wê derbarê de berdewam ji ber bînpêkirina mafê mirovan, bi taybet çaresernekirina pirsê neteweyî a Kurdan di Tirkîyê de rûbirûyê rexneyên tund bûye. Hewl û pêngavên vê dawiyê jî bo çareserkirina Pirsê Kurd li Tirkîyê jî rêya aştiyê, gotûbêj û siyasîyane ve dibe sedema cihgirbûna demokrasiya rasteqîn li Tirkîyê û alîkariyek baş bo pêvajoya endambûna wî welatî di YE'ê û wergirtina Tirkîyê wek endam di wê yekîtiya bihêz û xurt a cihanê de ku ji bo Tirkîyê pîrr giring e.

Çareserkirina Pirsê Kurd li Tirkîyê pêwîstî bi qebûlkirina rastiya hebûna wê doza rewa û herwiha pêngavên cidî û piratîkî û çareseriyê bîngehî heye û niha ji qonaxa gotin û dirûşman derbas bûye.



Wêne: AFP

RONÎ

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

Ebdullah Hicab



Şev Çû Ma Tu Êdî Hev Tê Lo ...

Aramê Tigran, yek ji sitûnên huner û strana Kurdî di nîvsedeya borî de, roja 8ê Tebaxê ji hunera Kurdî

û hezkiriyên dengê xwe malavayî kir. Aram, hunermendê mend û aram, ji esla xwe Ermenî bû, lê di hunera xwe de sînorên ol û qewmîyetê derbas kiribû û di hunera Kurdî de bûbû xwediyê mektebekê ku dê piştî mirina wî jî hertim bijî. Taybetmendiyên mekteba Aram ya stranê, ciyê wî di dilê her kesî de vekiribû. Evîndar û şorişger, nexweş û şahîgêr, têr û bîrsî, heyî û neyî her kesî soza dilê xwe di stranên Aram de peyda dikir. Di yek gotinê de, dengê Aram, rengvedana soza dilê bişewat bû.


Lê ji xweşiya stranê pitir, dengê Aram bi sala ye ji pir kesan re weke sembola wefadarî û vejînerê bîranînên biqîmet e. Ev deng, di rojên xweşî û nexweşiyê de ji hin kesan re bûye heval û hevraz. Lewma ji destdana Aram, valahiyekê ne tenê di hunera kurdî, lê her wisan di jiyana hezkiriyên wî de pêk tîne.

Hezkirina min ji dengê Aram re, diçe salên destpêka 80yan, dema ku taze ez bûbûm pêşmerge. Stranên Aram ji bo bîranîna rojên zarokî, jiyana li gundan û heza ji kok û bîngeha jiyane re, her demê hêz dida meriv. Lê ev heza xwezayî, hêdî hêdî manayek sembolîk ya pir mezin girt û bû beşek ji jiyana min ya siyasî. Êdî dengê Aram, ne tenê kok û orjîna jiyane, lê hez û hêviyên pêşerojê jî temsîl dikir û bû hevraz û hevsozê her demê.

Sala 1986, derbiharek zû bû ku Pêşmergeyên Hêza Agirî, ji ciyê bêhnvedana xwe ya zivistanê li Başûrê Kurdistanê ber bi navçeyên Urmiye û Selmas li Rojhilat vedigeriyan. Berî vegeê, hem ji bo xatirxwestin û hem ji bo amadekariyên dawî, wefdek ji kadr û birêveberên navçeyê, bi serperistiya kekê Elî Kaşîfpûr hatibûn gundê "Gewredê" ku "Deftera Siyasî" ya PDKÎ lê dima. Wê demê bi rehmêtî Mikayîl Baso, an wek di nav hevalan de dihate gotin "Kak Meko" re me di Radyo Dengê Kurdistanê de kar dikir. Ji bo birêkirina hevalan, em her du, serêvariyekekê çûne bal wan. Kekê Elî, dema xatirxwestinê, hate serê me her duyan û hin pêşniyar û rêniwênîyên kar dan. Berî ku em ji hev dûr bikevin, daxvaz kir ku her dema nûçeyek li ser herêmên bakûrê Rojhilata Kurdistanê tê weşandin, bila ji Radyo Dengê Kurdistanê, stranek Aramê

Tigran bê weşandin. û bi gotina dawî, rondikên me her duyan hatne xwar: Dema ez şehîd bûm, strana "Xwezî dîsa zar bûma ..." biweşînin.

Me dizanî ku têkoşîna bi wî rengî, şehîdbûn li pey re ye û her meh û hefteyekê, nûçeya şehîdbûna yek an çend pêşmergeyên canfida dihat. Lewma bûyereka weha ne dîr bû, lê dîsan, kesî pêşwext, xwe ji şehîdbûna hevaleyê nêzik re amade nedikir û ji basek weha jî hez nedikir. Ji bo ku em nekevin bin bandorê, min bi henek ji kekê Elî re got: Ev stran ji bo bûyerên weha nehatiye danîn û heza zarokî û şehîdbûna di çeperê de pir ji hev dûr in. Elîyê nemir di bersivê de got eger cîhana zarokên me wek hez û xwesteka ku di strana Aram de tê ziman, bê xem



Aram Tigran

bimeşiya, pêwîst nebû li wan çîyan xwîn bê rijandin...

Sal çûn û têkoşîn berdeham bû. Her dema ku Elî vedigeriya navenda partiyê, bi hev re heta derengî şevê me stranên Aram guhdarî dikirin. Êdî dengê Aram, bûbû beşek ji jiyana rojane. Li gor Elî, dengê Aram dengvedana jiyane bû û hem di demên şahiyê de û hem jî wexta êş û azaran, dengê Aram dil vedihesand. Gumana min nebû, ev Aramê ku aramî dida dilan, êdî bûbû pêşmergeyek ku her demê li rêza pêşîn ya pêşmergeyan di çeperê de bû, û her nebe ew ciyên ku Elî lê, dengê Aram jî lê bû.

Heza Elî ji dengê Aram re wisa bê sînor bû ku ji bo Elî tu gavê ji Aram dûr nekeve, navê kurê xwe yê dawiyê danî "Aram". û hêviya Elî ev bû ku rojekê bi Aramê xwe re, Aram gazî bike Kurdistanê Azad û bi hev re cejna serkevtinê bigrin.

Lê mixabin Aramê sava, bi germahiya hez û hêviyên Elî yê xwedî bawer mezin

nebû û Elî bi Aram re cejna serkevtinê negirt. Meha tebaxa 1990 di şevê reş de li bajarê Konya li Tirkîyê, hêzên tarîperest destên Elî ji destên nazîk û li benda nazarên Aramê sava qedandin û ew ber bi qederek bi êş û jan ve birin. Şev çû û Aram her li bendê ma ka kengî babê dil pir ji hez yê wî dê vegere. Stêrka sibê hilda, lê Elî her nehata. Roj hat û çû, rojên din û rojên din û sal û salên din bi dûv hev re meşiyan ... lê êdî Elî venegeyriya.

Dema nûçeya şehîdbûna Elî hat, mixabin ne kak Meko û ne jî min, derfet hebûn ku hêvî û wesiyeta Elî bi cîh bînin. Lê, bi dilek bi xem min li ser milê xwe re avirek ji taxçe da û temaşeyê kasetaya dengê Aram kir. Bê hemdî min û bi lorîkan "xwezî dîsa zar bûma" ... hat. Ji wê demê ve hemû salan di şeva 16 ê tebaxê de, bi bîranîna Şehîd Elî, guhdariya dengê Aram dikim, lê li bedela "xwezî dîsa zar bûma ..." strana "şev çû êdî ma tu hev tê lo, ez ranazê me bê te kengî xew tê lo, xanî bûye zîndan tê da ranazê me, ta sipêdê qîr û neîfî tev tê lo" ji bo min hevrê û hevraz e.

Îsal havînê, tenê çend roj ji salvegera şehîdbûna Elî Kaşîfpûr re mayî, dubare li baxê Kurdistanê bû zivistan ... û vê carê Aramê Tigran çû ser heqîya xwe. Xuya ye ku dilê Aram bi evîn û soz û rîya xebata Elî re yek bû, lewma di heman mehê de ku Elî hatiye şehîdkirin, Aram jî xatir ji cîhan û jiyane xwest.

Lê li pey her zivistanekê re biharek geş û jiyane nû tê. Bayê ku ji "hêfîna bilbilê" Aram xistî, çî qas xurt be û hêza wê çî qas zêde be, dê nekare bi ser îradeya dost û hezkirî û hevalbendên Elî û Aram de bi ser bikeve. Dê êş û azarên demê derbas bin û "bax û bostanên" "Feqiyê Teyran" dubare vegeşin û gulîstana ku bi xwîna Elî û têkoşerên azadiya Kurdistanê hatî xemilandin vegeşînin. Dê hezkiriyên dengê Aram û rêbaza Elî, bi gulên geş ên vî gulîstanê û bi dilxweşiya evîna Kurdistanê ber bi pêşwaziya dilberên xwe ve herin û bi kenîya xweşiyê "derî ji wan vekin".

Bawerî û rêbaza şehîd Elî Kaşîfpûr û deng û nîrxên ku hunermend Aramê Tigran li pey xwe hiştin, wê heta hetayê di dilê gelê Kurdistanê de bimînin. Weke çawan bi şehîdbûna Elî re, nav û rêbaz û têkoşîna wî hê bilindtir bû, dê Aramê Tigran jî li bîra tu kesî neçe. Dilê pir ji hez û evîn ya Aram êdî lê naxe, lê deng û bîranînên wî dijîn û ji niha û pê ve dê hê bilind bin.

Pîrozbahî

16ê Tebaxa 2009an, 63 sal bi ser damezirandina PDKÎ derbas dibe. Di 16ê Tebaxa 1945an de, PDKÎ li ser bingehên rêxistinî ên Komeleya Vejiyana Kurd hate avakirin. PDKÎ yekemîn partiya modern û xwedî bernamê û rêbazekî siyasî û demokratîk bû ku bi destê Pêşewa Qazî Mihemed hate avakirin. Em 64emîn salvegera avabûna wê partiye pîroz dikin.

Desteya Weşana Agirî



Paşkoya Taybet Bi Boneya 25'ê Gelawêjê, 64'hemîn Salvegera Avabûna PDKÎ

Hejmar: 117

Peyama Sekreterê Giştî Yê PDKÎ Bi Hilkevta 64'mîn Salvegera Damezrandina Wê Partiye

Hewelatîyên xebatkar!
Xûşk û birayên rêzdar!
Îro 25'ê Gelawêja sala 1388(16'ê Tebaxa 2009'an, Partiya

Demokrata ya Kurdistanê, partiya Komara Kurdistanê, **Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo, Dr. Şerefkendî** û hezaran şehîdên rêya rizgariya gelê me, partiya dehan hezar endam û alîgiran û bi giştî hizba gelê kurd di Kurdistanana Îranê de, 64'mîn moma temenê xwe hil kir.

Bi vê hinceta girse, ji aliyê xwe û rêberiya partiya me ya xebatkar pîrozbahiyên herî germ ji hemû gelê kurd, malbatên serbilind ên Şehîdên vê rêbazê û kadro, pêşmerge, endaman û alîgirên PDKÎ dikim. Herwiha ji hemû wan ezîzên me pîroz be ku di dema wan dehan salên xebatê de yar û yawerên partiya xwe bûn, di rojên dijwar de piştta wê girtin, ji reşebayê dijminên cor bi cor parastin, di têkçûnan de hêvî jê re dan û di serkevînan de jî şirikê şahî û xweşiyên partiye bûn.

Hevalên hêja û delal!

Damezrandina PDKÎ destpêka xebatek nû di pêvajoya xebata azadîxwazane a gelê kurd de bû. Sala avabûna PDKÎ bi damezrandina Komara Kurdistanê re hev dem e ku di parek ji axa Kurdistanana Îranê de ji aliyê PDKÎ û bi serokatiya Pêşewayê nemir Qazî Mihemed, Sekreterê Giştî yê wê demê yê PDKÎ pêk hat. Komara Kurdistanê yekem desthilatdariya kurdî bû ku bi azîz û usûlek hemdem hat avakirin û xwedî qanûn, dezgeh û sazîyên dewleteke nû a kurdî bû. Temenê wê komarê kêr û kin bû, lê gelek azmûnên giranbiha bo gelê me afirand. Piştî hîloşandina wê komarê, hemû temenê PDKÎ ji destpêkê heta îro bi armanca bîdestxistina mafê netewî bo gelê kurd li dijî rejîmên dîktator ên Paşatî û Komara Îslamî dîrokekî dijwar û bixwîn û teji berxwedan hebûye. Partiyek ku di hemû wê demê de di bin êrîş û komploya ku dewletên bihêz û her wiha neyar û nehezên cor bi cor ên navxweyî û derve de bûye.

Renge giringtirîn û taltirîna wan komployan, îdamkirina yekemîn Sekreterê Giştî Pêşewa Qazî Mihemed û gellek endamên din ên rêberiya PDKÎ û Komara Kurdistanê di wê demê de û herwiha bêdengîya nêzik 10 salan bi ser tekoşîna PDKÎ li pey wê bûyerê, piştî wan jî



terorkirina du Sekreterên jêhatî û navdar, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî û ew parçebûn bûn ku di wê demê de û di demên hestiyar de rûbirûyê PDKÎ bûne.

Di dîroka tevgera kurd di du sed salên borî de, gellek bizav bi şehîdbûna rêberekê ya têkçûn di eniyekî şer bi dujmin re, bi tevahî rastî têkçûnê hatine. Di dîroka hemdem de jî gellek ji wan partiye ku di Kurdistanana Îranê de pêk hatin û piştî demekê tune bûn yan bi tevahî ji bîra xelkê çûne û bandorek wisa li ser xelkê welatê me nemane.

Lê PDKÎ piştî wê dîroka dijwar, niha jî di Kurdistanana Îranê de partiya cihê bawerî û herî hezkirî ye, di kom û komeleyên navneteweyî û nawçeyî de partiyekî diyar û di Îranê de jî dost û dujmin jê re hesabê dikin.

Sedema wê rewşê siyasî ku PDKÎ tê de ye, vedigere bo gellek taybetmendiyên bilind ku ez li vir tenê îşarê bi sedemekî giring dikim, ew jî serdemîbûna wê partiye ye.

Hemdemîbûn bi wê wateyê ku eger PDKÎ 64 salan berî niha di zirûfekî taybet a siyasî û coxrafî bi armanca dabînkirina mafê çarenivîsa gelê kurd di Kurdistanana Îranê de wek stratejiyekî netewî û demokrasî wek garantiyekî herî xurt a wan mafan pêk hat, di taktîkên xwe de di pêvajoya gihîştin bi wê stratejiyê de, li gor serdem û civakê nermî nîşan daye û di

çarçoveya tu îdeolojiyekî de hişk û girtî nemaye. Ger Komeleya Vejiyana Kurd wek rêxistinekî neteweyî ya teskbîn kevirê binêşa PDKÎ pêk tîne, piştî wan guhartinên siyasî ên ku 3 sal piştê di herêmê de tîn holê, PDKÎ tê damezirandin ku partiyek demokrat bi siyaseta û bernamê vekirî û digel siyasetekê rehevterîb bû ku di wan salan de siyaseta çîhanî û herêmî hebûye.

Ligel derbazbûna demê û şiroveyekî hûr li ser rewşê, navê partiye dibe Partiya Demokrat a Kurdistanana Îranê, dirûsmên srtatejîk ên wê bo "Demokrasî bo Îranê û Otonomî bo Kurdistanê" piştê avakirina sistemeke demokratîk a federal li Îranê û dabînkirina mafê neteweyî bo neteweya Kurd di Kurdistanana Îranê de tîn guhertin.

Di pêvajoya wan guhertinan di dirûsmên stratejîk de û rewşa sepanî bi ser tekoşîna PDKÎ, organîzasyon û ew qanûnparêziyên ku rêxistinên wê li ser hatine çêkirin, di guhertinan de bilez bûn. Bi vî awayî li gel berteskîbûna çada xebata PDKÎ bi sedema îlegalbûna wê di serdemê rejîmên Paşatî û Komara Îslamî de, PDKÎ karî ji wan meydanên bertesk bi awayekî baş û jêhatî mifahê bistîne û di xebat û berxwedana xwe de berdewam be. Encama wî karî ew bû ku xebata nepenî li serdemê Paşatî û piştî nemana wê rejîmê jî bo heyamekê xebata aşkera, li pey hîloşîna wê rejîmê bi şeweya rêxistin, çekdarî û heta rêvebirina beşekî biçûk ji

Kurdistan û piştî wê jî dubare xebata nepenî, dîplomasi û ragihandinê di serdemê desthilatdariya Rejîma Komara Îslamî a Îranê de bi serbilindî û şanazî ve kiriyê û dike.

Di çarçoveya wan guhertinan de, guhertina desthilatê bi awayekî demokratîk û qanûnî yek ji bingehên hilbijartina rêberiya PDKÎ ji jêr bo jor bûye. Di dema 64 salên borî de PDKÎ 14 kongre lidar xistine, erkên herî giring ên kongreyan li gor peyrewa navxwe ev in:

- Rapora Komîteya Navendî dinirxîne û birayê li ser dide.

- Rêbaza giştî û siyasatên stratejîk ên partiyê piştî nirxandinê diyarî dike.

- Bername û pêrewa navxwe a partiyê dinirxîne û ger pêwîst be destkarî dike û piştî dipejirîne.

- Endamên eslî û cihgir ên Komîteya Navendî hildibijêre.

Her wek di wan xalên peyrewa hundirîn de xuya dibe, pêkanîna guhertinan di rêbaza giştî û siyasatên stratejîk ên PDKÎ, bername û pêrew û endamên rêberiya partiyê ku desthilatên herî bilind di PDKÎ de ne, bi destê nûnerên bedeneya PDKÎ ku bi dengê nihênî û rasterast yê wan tîr hilbijartin, pêk tîr. Kongrên partiyê ku bingeha pêkanîna guhartinên kûr û bingehîn ên nav PDKÎ ne, di rewş û zirûfên gelek dijwar de, di bin bombebaran û topbarana dujmin de û di binekevîr û şikeftên çiyayayên Kurdistanê de birêve çûn.

Hevalên rêzdar!

Ev qanûnên ku guhertinan di PDKÎ de garantî û ewle dikin, bûn dezgeh û organên demokratîk û hatine cihgirkirin, lewra jî di PDKÎ de mawdaya xwesepandin û xwe ferzkirina bi ser yasayan bi tevahî hatiye berteskkirin, eger kes yan kesane bi her sedemê xwestibin û îrade kiribin ku li derveyî wan bingehên demokratîk û qanûnî ên nav PDKÎ, hejmonî û zorxwaziya xwe bi ser partiyê bisepînin û di çarçoveya berjewendiyên takekesî an girûpê de pêşiya wan guhertinan bigrin, ew kes di her pile û payeyekê de bûne, li gor van qanûnan ji ortê rabûne.

Xûşk û birayên rêzdar!

Di bin ronîya van taybetmendiyên pêşverû de û gellek ji xisletên din ên bilind ku di PDKÎ de hatine cihgirkirin, di wan dem û rewşên dijwar de ku pêla coş û heyecanê civaka Îranê û heta civaka Kurdistanê jî girtiye, di serkevtin û paşdekişanan de, di wan deman de ku ji ber helwêstên cuda û durist ên wê ketibû perawêzê, biray û helwêstên siyasî ên PDKÎ di çarçoveya berjewendiyê gel û pêşeroja çarenivîsa wan de derneketiye. Lewra niha jî piştî 63 sal xebat di rêya azadiyê di rewşên herî dijwar de xwe serbilind dizane ku partiya me di tevahiya wê demê de şaşiyekî wisa nekiriye ku di hember dîroka neteweya xwe de sernevi be.

Di wê pêvajoyê de hewce ye em qala şanogeriya hilbijartina Serok Komariyê li

Îranê bikin ku zêdeyî du mehan dibe di rojeva nûçeyên herî giring û pirbas ên navxwe û derve de ye û em dê helwêstên PDKÎ di wê derbarê de bas bikin.

Roja 12ê Hezîrana îsal, bîstemîn şanoya hilbijartina Serok Komariyê di Îranê de birêve çû. Ev binav hilbijartin wek 9 şanogeriyan borî jî, ekterên wê û ew kesê bi nav Serok Komar diviya navê wî ji sindoqên dengdanê bihata der, bi hûrî pîlan jê re hatibû darêtin.

Li gel wê yekê ku rejîmê karî bi pîlanên xwe wisa nişan bide ku şanogeriya vê carê bi wîyan berê re ferq heye û mixabin bi vî awayî carek din karî piraniya xelkê xwedî deng ê Îranê û heta hinek ji rêxistinên siyasî jî bixapîne û bikşîne ser sindoqên dengdanê û ji wê rêyê ve desthilata xwe a dijî gelfi rewşa û gelfi bide nişandan. PDKÎ durrî cencal û propagandaya rejîm û aliyan beşdar di dengdanê li navxwe û derveyî welat, piştî analîz û dahûrandineke rast û hûr derbarê rejîma Komara Îslamî a Îranê, bi Komeleya Şoreşger a Zehmetkêşên Kurdistanê Îranê re dengdan baykut kirin. Piştî ragihandina encama hilbijartinê û



eşkerêbûna dubare a wê rastiyê ku dengê xelkê tu bandorek li ser encama şanoya hilbijartinê nedaniye, xelk rîjiyan ser rê û şeqaman û dengê nerazî yê xwe dan xuyakirin.

Her çend di rojên piştî wan xwenîşandanên milyon kesî de dirûşma azadî û dijî dîktatoriyê hat dan, lê mixabin rêberiya wê xwepêşandana bixwîn di destê Mûsewî û Kerûbî, du berbajarên Serok Komariyê ma ku herdu ji mohreyên naskirî ên Komara Îslamî bûn û di hemû sûça û tawan û cinayetên ve rejîmê de bi awayekî rasterast û nerasterast beşda bûn û xwesteka wan jî wek peyrewên din ên rejîma Komara Îslamî bihezêkirina wê hikûmetê û heta veğerandina wê bo dewrana Xomeynî bû, pirsgerêka wan jî tenê bîdestvegirtina desthilata zêde di çarçoveya Rejîma Komara Îslamî de bû.

Beşek ji binav reformîstan û heta hinek rêxistinên siyasî gelek hewl dan ku xelkê Kurdistanê jî dakevin ser rê û şeqaman û tevî wê pêlê bibin ku di Îranê de pêk hatibû, lê Gelê Kurd ku xwestekên xwe di dirûşmên meş û xwenîşandanên bin

rêberiya Mûsewî û Kerûbî de nedidît, tede beşdarî nekir û amade nebû ji bo guherîna Ehmedînejad bi Mûsewî, berbajarên diyarîkirî ên sistema Wilayeta Feqîh û mohreyên naskirî ên Komara Îslamî gorîyan bide. Di wan bajar û herêman de ku neteweyên stemlêkirî ên Îranê tede niştecih in, kêr û zêde wan di meşan de beşdarî nekir. Bêguman ew jî nişana hişyariya bilind a netewa Kurd û neteweyên din ên Îranê bû. Di wê derbarê de Polîtburaya PDKÎ di daxuyaniyekê de serkut û qirkirina xelkê azadîxwaz yê Îranê ji aliya hêzên rejîma Komara Îslamî bi tundî şermezar kir û piştgirî ji xwestekên wan ên demokratîk kir.

Hevalên qedirgiran!

Piştî 63 sal xebat û berxwedan û wergirtina şîret û azmûnan ji paşvekişyan û pêşkevtinan niha em dikarin rabigehînin ku:

- Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê bi hemû wan pîrensîpên demokratîk pêbend e ku ji destpêkê heta niha di partiyê de hatine cihgirkirin û îro jî piştî 63

salan, di refa herî pêş a pîrensîpên pejirandî ên civaka pêşverû a cîhanê ne.

- Em piştgiriya jî mafê wekheviya jinan di nav civak û malbatê de dike û radigehînin heta wê dema ew maf ji bo wê qata mezin a civakê neyê dabînkirin, em nikarin îdea bikin ku Civaka Kurdî gihaye

demokrasiyê.

- Ciwan sermayên îro û pêşeroja PDKÎ û welatê me ne, her wek heta niha jî piraniya herî zêde a şehîdên me, endam û Kadro û Pêşmergên me ji ciwanan pêk hatiye. Di wê derbarê de em xwe berpîrs dizanin ku bo perwerdekirin û sipartina berpîrsiyariyan bi ciwanan, meydana kar di nav PDKÎ de ji bo wan vekin.

- PDKÎ xwe wek partiya hemû tex û qatên civaka Kurdewarî dizane.

- Demokrasiyê wek yek ji bingehên giring ên Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê ye. Xwendina me ji demokrasiyê bi kurtî ew e: giringîdan bi hizr û baweriyên cuda di hundir û derveyî partiyê de, gotûbêj wek rêya herî baş ya lihevkerin ji bo armancên hevbeş, hewldan ji bo rêxistin û yekîti û yekrêziya gelê me bi armanca gihîştin bi xwestekên netewî û demokratîk ên gel.

Di dawiyê de careke din 64mîn salvegera damezrandina PDKÎ ji hemû Gelê Kurd pîroz be.

Serkev e xebata Gelê Kurd di rêya azadî û bîdestveanîna mafê netewî de.

Cigirê Sekreterê Giştî yê PDKÎ, Hesên Şerefî:

PDKÎ Li Ser Bingeha Rêxistinî A Komeleya Vejiyana Kurd Hate Damezrandin, Lê Bi Navê Partiya Demokrat Ya Kurdistanê û Bi Bername û Naverokê Modern Tir û Pêşkevîtir

16ê Tebaxa 2009an, 64mîn salvegera damezrandina Partiya Demokrat ya Kurdistanê (PDKÎ) bû. Ev parti 63 salan berî niha di roja 16ê Tebaxa 1945'an de li ser bingehên rêxistinî ên Komeleya Vejiyana Kurd (J K) li Mehabadê hate avakirin û di sala yekem a damezrandina xwe de yekemîn desthilata Kurdî bi navê Komara Kurdistanê ava kir. PDKÎ partiya herî mezin û xwedî endam û nifûz di Rojhilatê Kurdistanê de ye û ji bo azadî, demokrasî û mafê netewî yê Kurdan tekoşînê dimeşîne. PDKÎ çend hezar Şehîd di rêya azadiya Kurdistanê de daye, Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Abdulrehman Qasimlo û Dr. Sadiq Şerefkendî ji rêberên şehîd ên navdar yên wê partiyê ne ku bi destê rejîmên kurdkuj ên Pehlewî û Komara Îslamî a Îranê hatin şehîdkirin. Di 64mîn salvegera avabûna PDKÎ de me çend pirsên taybet li ser dîroka avakirin û armanc û stîratêjiyên wê partiyê raberî Cigirê Sekreterê Giştî yê PDKÎ, Hesên Şerefî kirin:


Hevpeyvîn: Luqman Ebdulazade

Birêz Hesên Şerefî, niha jî parek ji wan kesên ku haydar û şarezayê bûyeran in yan di vê

derheqê de xwendin û lêkolîn hene, jî vê yekê dudil in ku PDKÎ li ser bingeha rêxistinî a Komeleya J-K'ê hatibe avakirin. We çî gotinek bo wan kesan heye?

Hesên Şerefî: Kesên ku derbarê vê meselê dudil in yan guman hene ku Hizba Demokrat li ser bingeha rêxistinî a Komeleya J-K'ê (Komeleya Vejiyana Kurd) hatibe avakirin, pitir ji wê ku li pey rohn û eşkerekirina babetek dîrokî çûbin, zêdetir di hizra qetandina pêwendiya navbera bedeneya rêxistinî a J-K'ê û PDKÎ ne û bo vê meremê jî amade ne heta dîrokê jî berevajî û tevlihev bikin. Ew jî ne dîrokek ewqas dûr, ji ber ku ewqas nêzik ku heya çend salan berî niha jî beşek berbiçav ji avakerên Komeleya J-K'ê û Hizba Demokrat di jiyandê de bûn û destgihîştin bi wan bona standina zanyariyan tiştêkî dijwar nebû. Xêncî wê jî dema ku mirov mîzeyî navê avakerên Komeleya Vejiyana Kurd û PDKÎ dike, mirov dibîne ku di rastî de her yek in û bi damezirandina Hizba Demokrat hemû endamên rêberiya Komeleya J-K'ê di rêberiya PDKÎ de cih girtine. Herweha di nav bedenê de jî endamên Komeleya J-K'ê demildest xwe wek endamê PDKê nasandine û guhertin di nav û naveroka bernamêya Komeleya J-K'ê de bi guhertinek pozetîv û pêşketîtir ji rêxistina xwe dizanîn û hest bi vê çendê nedikirin ku ji rêxistinekê ve bo nav rêxistinekê din çûbin. Bi giştî di bedeneya Komeleya J-K'ê de bi zehmet kesek tê dîtin ku piştî vê guhertinê xwe di nav rêxistina PDKÎ de nedîtibe.

Paşan ger PDKÎ li ser bingeha Komeleya J-K'ê nehatibe avakirin, başe piştî



damezrandina PDKÎ, bedeneya Komeleya J-K'ê çî jê hat? Gelo herwusa bê hest û xwast heliya? Ger em bêjin di bin pirrengiya Hizba Demokrat de kêm reng û nediyar man, başe piştî ku Komar hat rêxistin û ji aliyê rejîmê ve ketin ber êrîşê, û ketin ber êrîşa rejîmê ku endamên Hizba Demokrat serbarê wan hemû zehmetî, girtin û dîrketanin, dîsan mewcûdiyeta xwe bi awayên cur bi cur nîşan didan û parti di meydana xebatê de zindî ragirtin, çima wê demê tu nîşaneyek ji rêberî yan bedeneya rêxistinî a Komeleya J-K'ê nedihat dîtin? Li kuderê hatiye dîtin ku bi damezrana partiyekê, rêberî û bedeneya rêxistinekê din demildest û bêdeng nemîne?! Yê ku di rêberî û bedeneya Hizba Demokrat de piştî hilosîna komarê hatin girtin yan koçberî derveyî welat bûn, di rastî de her ew kesatî bûn ku avakerên Komeleya J-K'ê û rêxistina wê komeleyê bûn, nemaze roja damezrandina PDKÎ, anku 25'ê Gelawêjê hate diyarîkirin ku 3 salan berî wê,

Komeleya J-K'ê her di wê rojê de hatibû avakirin.

Ji bilî vana, tu bêjî ger her ew bedene û rêxistina Hizba Demokrat, her ew rêxistina Komeleya J-K'ê nebûya, dê bikariye bi wê rêberiya zana û bernamêya pêşketî ya xwe jî di heyamê 6 mehan piştî avabûna xwe de ewqas pêşve bikeve û xurt bibe, bikare Komara Kurdistanê ava bike? Evane û komek belgeyên din vê rastiyê nîşan didin ku PDKÎ li ser bingeha rêxistinî a Komeleya J-K'ê hate damezrandin, lê bi navê Hizba Demokrat û bi bernamê û naverokê modern tir û pêşkevîtir.

Avabûna PDKÎ di pêvajoya xebat û berxwedana neteweya Kurd de, di sedsalên 20'an de bûyerek girîng û dîrokî ye. Bi avabûna Hizba Demokrat bo yekemîn car partiyek modern û xwedî programek pêşketinxwazane kete qada xebata siyasî ya Kurd û gelek têgih û mijarên siyasî yên nû anîn nav

xebata siyasî ya wî gelî û ew ji gellek kevnepoyan û herwiha girêdayîbûna xebatê bi takekes, Serok eşîret, şêx û ... rizgar kir. Hûn li ser vê yekê çawa difikirin?

Hesen Şerefi: Bêguman bi avabûna PDKÎ, guhertinek girîng û bingehîn di xebata kurd de pêk hat, bo yekem car partiyek pêk hat ku bawerî bi rêvebriya giştî hebû, dirûsmên wê pêşkevî bûn, meseleya demokrasî û azadiya raderbirinê jêre bingeh û girîng bû. Girîngî bi handan jinan bo beşdarî di qada xebatê û çalakîyan di civakê de dida û bi hêviyên pêşerojê dizanîn û ji bo paşerojê dielimandin. Pêwendiya salim bi neteweyên Îranê û bi taybet Azerîyan bi hewce dizanî û di heman demê de jî hest û soz bo parçeyên din yê Kurdistanê hebû û dil û hembêza wê ji wan re vekirî bû. Di civaka olî a pirreng û heta hişk a mesebî ya wê demê de, dirûsmên wê bi awayekê bûn ku wateya cudayîya ol ji siyasî bide û hemû ev taybetmendî jî di Komara Kurdistanê de wek destkevtêk siyasî û girîng ya vê partiyê reng vedan û paşan jî heyânî îro roj bi rojê zêdetir geşe kirine û zêdetir cihgir bûne. Ev taybetmendî û pîrensîpane bi salan e ku xemla siyasî ya PDKÎ ne û ev partiye pê nas kirin û şanazyek mezin û binirx e bo vê partiyê.

Kek Hesen, hûn wek kesek ku bi salan e di nav refên PDKÎ de xwedî berpirsyarî bûne û ji nêzik ve haydarê bûyeran in, hûn rol û nexşê PDKÎ di mîdehê van 64 salane de çawa dinirxînin?

Hesen Şerefi: PDKÎ di pêvajoya xebata tevgera kurd de nexş û rolek berçav hebûye. Her avabûna wê partiyê û dirûsmên pêşketinxwaz yê wê di cihê xwe de şewazek din ji xebata azadîxwazane ya kurd anî rojevê. Pêkanî û avakirina Komara Kurdistanê yanî desthilatek komarî bû ku bo cara yekemê

“Di Îranê de tu car desthilatek însanî û demokratîk li ser kar nebûye ku bawerî bi bihayên mirovî, mafên netewî û demokrasîyê hebe û girîngiyê bi xwast û daxwazên xelkê bi giştî û bi taybetî kurdan bide”

di dîroka kurdan de derket holê û kurd di qonaxek ji dîrokê de bi parek ji xwast û hêviyên wê gihand. Di bizvandî û parastina seha netewî a kurdan de rolek berbiçav listiyê û ji bo nasandina neteweya kurd û doza kurd hewl daye. Li giringîdan bi pirs û mafên jinan û ciwanan taboşikên bûye û giringîdan bi demokrasîyê nekiriye bi paşkoya tu bawer û îdeolojiyên din. Berjewendiya neteweya kurd li serweyî hemû tiştêkê daniye. Hilgirtina ala rizgariya neteweyî bo mîdehê 64 salan e ku bilind ragirtiye. Di vê derheqê de jî gelek rêber û kesayetiyan xwe gorî kirine. Her ev tişt in ku bûne sebebê xweştevîbûna PDKÎ di nav xelkê Kurdistanê de û bûye cihê bawerî û hitbara neteweya Kurd.

Yek ji şanazyên PDKÎ, avakirina Komara Kurdistanê ye, serbarê berçavgirtina xalên bihêz û lawaz yê her partî û rêxistinekê, lê çima heya niha hêvî û armancên PDKÎ û Komarê bi cî nehatine?

Hesen Şerefi: Şirovekirina vê meseleyê ku çima gelê kurd li Kurdistana Îranê heyânî niha serbarê ew hemû xebat û xwîn û bedel û gorîdanan bi maf û xwastên xwe negihîştîye, hewcehî bi

“PDKÎ li ser bingeha rêxistinî a Komeleya J-K'ê hate damezrandin, lê bi navê Hizba Demokrat û bi bername û naverokek moderntir û pêşkevîtir”

vekolînê kûr û pîralî yê siyasî, aborî, civakî ye û xebata wê heye ku her yek ji wan bi nobeya xwe li ser domkirina vê bêmafîyê ku Kurd pêre berbirû ye, bibandor in. Lê bi kurtî em dikarin bibêjin ku mixabin di Îranê de tu car desthilatek însanî û demokratîk li ser kar nebûye ku bawerî bi bihayên mirovî, mafên netewî û demokrasîyê hebe û girîngiyê bi xwast û daxwazên xelkê bi giştî û bi taybetî kurdan bide. Ne tenê her desthilat, belku partiyên opozîsyonê jî ku bas ji demokrasîyê dikin, gava ku tê ser pîrsa netewî a neteweyên pêkhêner ên Îranê û meseleya Kurd, tûşî bîrteskiyê dibin û çavên wan bilind nabin û her carê û di her rewş û zirûfekê de bi awayekê xwe jê didizin.

Meseleyek din, tevî wê ku para herî zêde a keç û xortên neteweya kurd dilsozê neteweya xwe ne û daxwaza dabînbûna mafên netewî yê xwe dikin û bi piştevaniya vê beşê ji hêza gel, qenaetê dikin û bo rizgariya wan xebatê dikin. Herwiha bona jinavbirina wan kêmasîyan hewce ye em xebata xwe berfirehtir bikin û hemû curên ji xebata rewşa û berheq bigrin pêşberî xwe ku hemû aliyek bi liberçavgirina rewşa xwe bikarin têde beşdar bin. Bi xweşî ve niha pêvajoyê her ber bi vê armancê diçe ku eva jî hêvî bi serkevtinê zêdetir dike.

Meseleyek din ya girîng û bi bandor di vê derheqê de, yekdengî û yekgirtî nebûna hêzên siyasî yê Kurd e ku mixabin ceribîna yekgirtin û bihevve bûn û yekdengiyê kême, lê jihev veqetîyan û ji hev silbûn gellek e. Bêşik eva jî di cihê xwe de him tesîr li ser hevgerînbûna xelkê dike, him jî şîyan û karîna kurdan li hemberî rejîmê, jar û lawaztir dike. Niha her çiqas bi awayekî jî be, pir aliyan hest bi meseleyê kirine û carcar bas ji yekgirtinê dibêjin. Lê heya niha derfetek baş bo vê pîrsa girîng derneketiye holê ku em hêvî dikin di pêşerojê de hest bi hewcehiyek zêdetir bikin û ked û tekoşînek zêdetir jê re bidin.

Tiştêk din ku pêwîst e îşare pê bihê kirin, pîlan û kompilyên rejîmê ne. Bi vê wateyê ku rejîm gelek bi micidî hewlê dide ji ferq û cudahiyan mesebî, zaraveyî û baweriyên kultûrî yê xelkê Kurdistanê mîfaha xirab bistîne û bi mezin û kûrtîkirina van valahiyan pêşîya yekrefî û yekdengiya neteweya Kurd bigre, ku eva jî hay û hişyariyek tewaw jêre hewce ye û pir girîng e ku tev aliyek bona pûçkirina wan pîlan û kompilyon xebat û tekoşîne bimeşnînin û demokrasî û mafên netewî yê Kurdan li serweyî hemû tiştêkê danên.

Diyare siyaseta bişaftin û asimîlekirina çandî û hiştina deverên kurdakincî di xizanî û belengaziyê de û komek meseleyên din yê cihanî û deverî, bi bandor in ku derfeta îşarekirin bi hemûyan di hevpeyvînek wiha kûr de tune. Lê eva nahê wê wateyê ku ev hev kêşane têk naçin yan guhertin bi ser wan de nahê. Ez li ser vê baweriyê me ku îrade û yekîtiya kurdan û berdewamî di xebatê de dikare wê rewşê bi wêc û berjewendiya kurdan biguherîne û niha heya qasekê jî nîşaneyên van guhertinan tî xuyakirin, lê hewce ye ku em bi xwe jî li ser pêvajoya ber bi pêşveçûna van guhertinan bi qazanca zêdetir a kurdan bibandor bin.

Cejna 25ê Gelawêjê Bi Coşeke Germ Hate Pîrozkirin

A girî: Li piraniya gund û bajarên Kurdistana Îranê cejna 25ê Gelawêja îsal bi

coşek germ û taybetî hate pîrozkirin.

Bi hilkevta cejna 25ê Gelawêja îsal, 64mîn salvegra avakirina Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê, li piraniya gund û bajarên Rojhilatê Kurdistana, binkeyên PDKÎ li Başûrê Kurdistana û çendîn welatên Ewropa, Amerîka, Kanada û Ustralyayê şahî, semînar û çalakîyên cur bi cur birêve çûn.

Endam û alîgirên nihênî û qehreman ên PDKÎ li seranserê Kurdistana Rojhilat, ji Makû heta Îlamê bi çalakîyên cuda cuda Cejna 25ê Gelawêjê pîroz kirin.

Hinek ji çalakîyên ku bi wê hincetê hatin lidarxistin, ev in: Belavkirina daxuyaniya PDKÎ û wêneyên rêberên şehîd ên PDKÎ û nivîsîn û belavkirina tirakt û dirûşmên taybet, belavkirina CD, hilkirina agir li ser çiya û bilindahiyên gund û bajarên û belavkirina şîrînî û şekrokan û pîrozbahîkirina gel ji hev.

Ev çalakî di rewşekê de birêve çûn, ku hêzên ewlekarî û Pasdar û ças û kirêgirtiyên Rejîma Komara Îslamî ji çend rojan beriya 25ê Gelawêjê, li Kurdistana rewşa awarte û hikûmeta leşkerî ragihandibûn û hemû hatin û çûnek kontrol dikirin.

Digel wan tedbirên ewlekarî û leşkerî jî, Endam û alîgirên nihênî û qehreman ên PDKÎ bi hevkarîya gel di nav dilê dijmin cejna 64mîn salroja damezrandina PDKÎ bi gireseyî û berfireh pîroz kirin. Piştî birêveçûna berfireh a cejna 25ê Gelawêjê, hêzên Komara Îslamî dest dane azardan û ezyet û girtina hevvelatîyên Kurd.

Di Binkeya Deftera Siyasî ya PDKÎ de li Bajarê Koyê yê Başûrê Kurdistana û bi beşdariya nûnerên partî û rêxistinên siyasî û civakî ên her çar parçeyên Kurdistana û sedan Kadro, Pêşmerge û endamên wê partiye şahiyek mezin û berfireh hat lidarxistin û Sekreterê Giştî yê PDKÎ bi wê boneyê peyamek xwend ku di vê hejmara Agirî de ketiye ber çavê we xwendevanên hêja ên Agirî.

Li Navenda 3 a Kurdistana jî cejna 25ê Gelawêja îsal bi coşek taybet hate pîrozkirin û Endamê Polîturoya PDKÎ, Kerîm Perwîzî peyama Deftera Siyasî a

partiye pêşkêş kir.

Di çendîn welatên Ewropayê, Amerîka, Kanada û Ustralyayê şahî, semînar û çalakîyên cur bi cur bi hilkevta cejna 25ê Gelawêja îsal, 64mîn salvegra avakirina PDKÎ birêve çûn. Nûçe û raporên berfireh di wê derbarê de li ser malpera me bixwînin...



urmiye



Pîranşar



Bokan



Bokan

Mafê Mirovan



Nivîsîn: Peter R. Baehr
Wergeran: Mecid Heqî

Rola Mafê Mirovan Di Siyaseta Dereve De

Hilbijartina siyaseta mafê mirovan

Siyaseta mafê mirovan bi wateya hilbijartina navbera giringiyên e

(priorities). Ew tê wê wateyê ku dewlet diviya biryarê bide li kuderê û bi çi awayekî mafê mirovan li hember berjewendiyên giştî yên xwe wek tenahiya netewî, bazirganiya derve û alîkariya pêşveçûnê dabinên. Hizirkirin li siyaseta han dikaribe carna di hember de bibe hegera pirsên siyasî. Ger dewlet bixwazin, divê wê yekê bikin û siyaseta xwe hilbijêrin. Yek ji nimûneyên baş ku tînan zanîn, garantîkirina lîsansa şandiniyê (export) ye, bo nimûne firotina çek û çol û dezgehên din ên stiratêjîk bi dewletekê re ye ku mafê mirovan di wî welatî de tê pêpeskirin. Kijan siyaseta dê bê hilbijartin? *Tenahiya Netewî?* Dewleta han dikaribe pêwendiyek mezin bi pîrsa tenahiya navnetewî re hebe. *Siyaseta Abûrî?* Belkî bo pêşveçûna abûriya netewî bihêzkirina karteke taybetî di şandiniya derve gelek giring be. Ew hertim hatiye berbasê ku ger "Em wî karî nekin, dê hinek din karê firotina pêwîstiyên bo dewletan han bide û dê cihê me bê girtin." *Kar dan bi hemû kesî?* Pişeya han dikaribe gelek giring be bo pêşkêşkirina kar bi hemû kesî û bi vî awayî ger rêya wê bê girtin, ew li gor berjewendiyên netewî dibe xwekujî.

Ji ber wê yekê ye bizava karkerî gelek caran hemberî wê lêgerê, ji aliyekî dixwaze piştîvaniyê li mafên mirovan bike û ji aliyekî din jî rîska ji dest çûna kar û helên karî berçav digire. *Karabûn?* Li serî hemû wan basên hatî kirin, ne rohn e ger bê û lîsansa karê nardina alavan bo derve bi kompaniyên neyê dan, çawa dê alîkariya pîrsa mafê mirovan bê kirin. Ew kare rege bibe hegera li tehlûke xistina tenahiya netewî, berjewendiyên abûrî û ji navbirina şansê karkirinê bo hemû kesî bê wê yekê ku tiştêkî mezin di warê mafên mirovan de bidest anîbe. Lewma biryara nerênî li ser pesendkirina mafê firotina alav û tiştan bo derve belkî gelek giran bikeve û kar bike ser siyaseta din jî û tenê hesta xweş ya "me jî tiştêk kir" bidest bîne. Ewa di warê exlaqî de bo welatîyêkê belkî hestekî gellek xweş be.

Herçend pirsên exlaqî û rewîştên baş gelek giring in, lê ew tenê nikaribin navenda hizr û rênîşanên dariştina siyaseta derve bin. Dewlet dema siyaseta xwe ya derve dadirêjin li wan welatên ku pîrsa pêpeskirina mafên mirovan hene di gel biryarên zehmet rûbirû dibin.

Dîrok Û Curên Femînîzmê

Serbest Hacîzade

Femînîzm wek tevgerêk tê hesibandin ku di çarçoveya regez, netewe û nejad de,

derketiye holê. Di hemem demê de femînîzm yek ji bizavên aloz e ku li ser wê gelek teorî û bîrdoz hene. Li ser yekemîn kes ku peyva Femînîzmê bikar aniye, nêrîn û hizrên cuda hene, bo mînak nêrînek bas ji wê yekê dike ku peyva femînîzmê yekemîn car ji aliyê "Charliz Frir" sosyologê îdealxwaz ve di sala 1837'an de hatiye bikaranîn, nêrînek din dibêje ku "Sharrl Fwrya" sosyalîsta sedsala nozdan bi armanca alîgirî ji bizav û tevgerên mafê jinan, peyva Femînîzmê bikar aniye.

Femînîzm pêkhatyek e ku gelek ji dîtîn û nêrînen civakî, siyasî û exlaqî bi xwe ve digre û pitir ji aliyê jinan ve hatiye pêşxistin. Ev Raman giraniya xwe dide ser tekoşîna hember ferq û cudahiyan regezî û pirsgrîkên jinan. Yekemîn tevgerên Feminîstî di sedsala 18'an û tevî Şoreşa Firansayê de dest pê kiriye. Bi wateyekî din regez û bingeha vê tevgerê vedigere ser Rojava nemaze di dema xebata reformîstî a sedsala 19'an de. Tevgera femînîzmê di nava ezmûnek 150 salî de, armancên xwe li ser guhartinên pêkhatyên aborî, siyasî û civakî bona ji navbirina cudahiyan regezî li ser jinan, bi raya giştî da nasîn.

Naveroka rastîn a femînîzmê ew e ku dibêje: Maf, berpîrsiyarî û erk nabe li gor regez were diyarkirin. Gelek ji rêberên bizava Fêminîstî jin bûne, lê belê ew nayê wateyê ku giştî Feminîst jin bûne û yan jin in.

Femînîzm, bîrdoz û bizavek e ku li gor wê hewce ye jin û mêr di warê siyasî, aborî û civakî de mîna hevdu bin. Pênasa han bi bingeha hevbeş a hemû baskên femînîzmê tê nasîn û wek binçîneya sereke a bîrdozê femînîzmê tê binavkirin. Ev bîrdozê li ser ferq û cudahiyan şibahetên (wekhevîyên) di navbera jin û mêran de tekezê nake û herwiha bona li kêlekê hêştina regaza nêr û yan jî tenê bona pêşxistina regeza mê nahê bikaranîn. Sedem û baweriyên cur bi cur li hember Femînîzmê, bûne egera derkevîna gotûbêj û nakokiyên li ser rastiya vê bizavê.

Renge hûn li ser naveroka femînîzmê bi kesên din re xwedî nêrînek hevbeş bin, lê belê nikarin tevî tîgîha baskek ji tevgera femînîzmê hevîkîr û hevneîn bin. Bo mînak regeza hûn li ser mijara

Feminism

bawerîhebûn bi wekhevîya jin û mêran di warên siyasî, aborî û civakî de bi kesên din re hevneîn bin, lê di hemem demê de hûn regeza li ser çawanîya pêkanîna mafên han û rêbazên wê, di nakokiyê de bin û nêrîna we ji kesên din re cudatir be û ne wek hev be. Di rewş û zîrûfekî han de hûn dikarin xwe wek femînîstek giştî binav bikin.

Bingeha Dîrokî a Femînîzmê

Di dîrokê de em dikarin alîgirên wekhevîya regezî û mafê jinan peyda bikin. Bo nimûne "Melîke Têodura" jina Roma Rojhilat, yek ji alîgirên pejirandina wan yasayan bû ku dibûn sebebê piştevaniya pirtir ji jinan û azadiya wan. "Kîrîstîn Dipîzan", yekemîn jina nivîskar û perofesiyonê bû ku beriya sala 1300'an, ji ber nedana mîratê ji bo jinan, pîraniya ramanên femînîstî ber bi pêşve bir.

Dîroka femînîzma modern weke felsefe û tevger, vedigere ser asta tîgîhîştina rewşên bîrên weke "Mêrî Wêrtîlî Montago" û "Markoîz Dikandurîst". Wan kesan piştevaniya xwe ji xwendina jinan diyar dikirin. Yekemîn saziya zanistî ya jinan di sala 1785'an de, li "Mîdîlborgê" (Bajarek e li başûrê welatê Holanda) hatiye damezrandin. Di wan deman de hebûna govar û rojnameyên ku mijarên taybet û zanistî derheq jinan çap dikirin, gelek girîng dihatin berçav û pêgehek giştî di nava jinan de ji xwe re bidest xistin. "Mêrî Wêrtîstîna Kîraft" (alîgîra mafê jinan li sala 1792) yek ji wan kesan bû ku bê tu şik û gumanek dikare weke kesayetiyeke xwedî hizra femînîstî were binavkirin.

Femînîzm di sadsala 19'an de weke bizavek wekhevîxwaz hate rêxistin û bû sebebê hişyarbûn û qebûlkirina xelkê wê demê ji ber hebûna bêdaletî û bêdadî li hember jinan. Bingeha Bizava femînîzma modern vedigere bo serdemê destpêkirina tevgera reformîstî a Ewrûpayê di sedsala 19'an de. Yekemîn civîn derbarê pîrs û mafên jinan di sala 1848'an de li bajarê "New York" a Amerîkayê hate lidarxistin. Di sala

1848'an de pirtûka "Can Êstîwart Mîl" a bi navê "Guhdarkirina Dengê Jinan" seba pesendkirina yasayên li dijî jinan anku yasayên yekregezi, hatiye weşandin. Navhatî di vê pirtûkê de nerazîbûn û dijberîya xwe derheq pesendkirina yasayên li dijî jinan diyar kiriye.

Gelek welatan di dawîya sedsala 19'an û di destpêka sedsala 20'an de, hêdî hêdî mafê dengdanê ji bo jinan di yasayên xwe de qebûl kir.

Nîyuzîland yekemîn welat bû ku di sala 1893'an de, mafê dengdana jinan pesend kir û "Keyt Şîpard" alîgîra mafê helbijartin û dengdana jinan, nemaze di salên dawî ên şerê yekem yê cîhanî rola xwe bo peştevanîkirin ji wê qanûnê bi raya giştî a Niyuzîland da diyarkirin.

Li vir em dixwazin tevî binavbirina curên femînîzmê dawiyê bi mijara xwe bînin.

Corên Femînîzmê:

- 1- Femînîzma Amazonî (Amazon Feminism)
- 2- Femînîzma Kultûrî (Feminism Cultural)
- 3- Eko Femînîzm (ECO Feminism)
- 4- Moderat Femînîzm(Feminism Moderate)
- 5- Pap Femînîzm(Pop Feminism)
- 6- Femînîzma Radîkal (Radikal Feminism)
- 7- Femînazî (Feminazi)
- 8- Femînîzma Takekesî (Feminism Librarian)
- 9- Femînîzma Matêryal (Feminism Material)
- 10- Êspartîst Femînîzm (Separatist)
- 11- Femînîzma Sosyalîst (Socialist Feminism)
- 12- Femînîzma Lîberal (Liberal Feminism)
- 13- Femînîzma Markîstî (Marxists Feminism)
- 14- Femînîzma Îslamî (Islamic Feminism)

Tendurustiya Jineke Mehkûmbûyî bi Îdamê Nebaş e

Jineke Kurd bi navê **Zeyneb Celaliyan**, ku bi cezayê îdamê hatiye mehkûmkirin û du sal

beriya niha di jora takekesî de hatiye ragirtin, niha nexweş e û tendurustiya wê ne baş e. Nûçegihanê Saziya Parastina Mafê Mirovan li Kurdistanê di vê derbarê de ragihand: Zeyneb Celaliyan du salan berî niha bi tawana kar û calakiyên siyasî û pêwendîgirtin tevî partiyekî Kurdistanî dijberê rejîma Komara Îslamî hatiye girtin û heya niha di joreke takekesî ya Îdareya Ewlekarî a Kirmaşanê de li jêr çavdêriyê de ye. Hewiha Zeyneb Celaliyan yekem jina siyasî a Kurd e ku di van çend salên borî de, bi cezayê îdamê hatiye mehkûmkirin.



Xortekî Kurd Di Pêşbirkêya Karatê De Pileya Yekem Bi Dest Anî

Xortekî werzişvan bi navê **Zanyar Ehmedî** xelkê

bajarê Merîwanê, roja 7'ê Tebax 2009'an, li pêşbirkêya giştî ya karatê di Tehranê de, di kêşa 60 kîloyê de pileya yekem bidest xist.

Nûçegihaniya Kurdistanê di vê derbarê de ragihand, ev pêşbirkê di hola werzişî a Olempiyada Tehranê de birêve çû. Hêjayî gotinê ye



ku hejmarek zêde ji werzişvanên rîşteya karatê di kêşa 60 kîlo de li seranserê Îranê di vê pêşbirkêyê de beşdar bûn.

Li Bajarê Kamyaranê Civanekî 16 Salî û Diya wî , Xwe Kuştin

Civanekî temen 16 salî tevî diya xwe bi navê **Fatime Qurbanî**, bi sedema

belengazî û destkurtî û pirisgirêkên aborî xwe kuştin.

Nûçegihaniya "Herena"yê da zanîn, wan du kesan bi sedema destkurtî û xizaniyê xwe avêtin nava Bendava Gawşan a Kamyaranê û di encam de jiyana



xwe ji dest dan. Hêjayî gotinê ye ku serjimêriya xwekuştinê bi sedemên wek hev li bajar û herêmên Rojhilatê Kurdistanê di heyamê sê mehên borî de bi awayekî berfireh zêde bûye.

Kuştina Kasibkarên Kurd Her Dom Dike

► Kuştin û birîndarkirina kasibkarên Kurd ên ser sînorên Rojhilatê Kurdistanê ji aliyê hêzên Kurdkuj ên rejîma Komara Îslamî a Îranê dom dike. Her di van çend rojên derbazbûyî de, dîsa çend hevvelatîyên Kurd ji aliyê çekdarên rejîma Îslamî ve hatin kuştin û birîndarkirin.

Hêzên çekdar ên Komara Îslamî a Îranê roja 06ê Tebaxa 2009'an, li devera Kotal a Xoyê li ser sînorê Haştêcûkê teqe li çend kasibkaran kirin ku di encam de ciwanekî Kurd bi navê **Hesen Ehmedînijad** temen 17 salî hate birîndarkirin.



Herwiha roja 11ê Tebaxa 2009'an, li devera Elend ser bi bajarê Xoyê li ser sînorê Îran û Turkiyê, hêzên întizamî yê rejîma Îslamî a Îranê teqe li kesekî bi navê **Xalid**, xelkê gundê Belesora Jor kirin. Navbirî bi sedema vê êrîşê bi dijarî hatiye birîndarkirin.

Her di doma êrîş bo ser kasibkarên Kurd de, şeva 7ê Tebaxa 2009'an, hêzên întizamî ên rejîma Komara Îslamî li ser sînorê Îran û Turkiyê li nêzik gundê Kozereş ser bi devera Selmasê, ciwanekî Kurd bi navê **Faxir Mihemedî** dan ber êrîş guleyan û kuştin. Piştî ku teqe li Faxir tê kirin, navbirî her li wir jiyana xwe ji dest dide.

Hêjayî gotinê ye ku çend rojan berî niha jî kasibkarekî Kurd bi navê **Sirac Musalò** xelkê Mîromerana Xoyê ji aliyê hêzên întizamî ên rejîmê ve teqe lê hate kirin ku di encam de navbirî jiyana xwe ji dest da.


Herwiha roja 12ê Tebaxa 2009'an, jî hêzên rejîma Komara Îslamî ya Îranê li ser sînorê bajarê Pîranşarê êrîş kirin ser çend kasibkaran. Bi sedema wê êrîşê kasibkarek bi navê **Salih Xalidî**, temen 43 salî, xelkê bajarê Mehabadê jiyana xwe ji dest da.

Hêjayî gotinê ye ku rejîma Komara Îslamî termê navhatî bi mercekê dide malbata wî ku di hemen şevê de veşartin.

Êrîş bo ser kasibkarên Kurd ên Rojhilatê Kurdistanê berdeham e û rojane bê sedem welatîyên sivil û bêguneh ên Kurd ku bo debara jiyana malbatên xwe kasibkariya ser tixûban dikin, dikevin ber teqeya guleyên çekdarên Komara Îslamî a Îranê û tîn kuştin û birîndarkirin.

PARASTINA XWEZAYÊ

ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com



Xweza, hêlîna hemû giyanewerên ku li ser rûyê dinê dijîn e. Her wiha asêgeh û parêzgeha jiyana wan e jî. Heke xweza neyê parastin, jiyana jîndarên heyî jî nayê parastin. Hemû jîndar di vê hêlînê de zêde dibin û dijîn.

Mirovhezî, hawirparêzî û hestyariya li hemberî jîndaran jî bi parastina xwezayê ve girêdayî ye. Ji bo wê, divê beriya her tiştî xweza were parastin. Bê guman berpîrsiyariya parastina xwezayê ayidê mirov e. Belê mixabin yê ku zêde xisarê dide xwezayê jî dîsa mirov e. Ligel ku mirov di nava van jîndaran de yê herî hişdar û bihişmet e jî, dîsa tu ajal û rihberên xwezayê bi qasî wî/wê xisarê nade xwezayê.

Ne tenê heyberên jîndar, hemû heyberên ne jîndar jî di goşa xwezayê de têne parastin. Û ji hêla mirov ve têne bikaranîn û xebitandin. Ev xebitandin jî, ji ber ku pêwendiyên navbera mirov û xwezayê bi awayekî asayî an jî erênî pêk nayê, gelek xisar û tehteyê dide giyanewerên din. Hemû giyanewer hem ji xwezayê sûd werdigirin û hem jî bi hebûna xwe xwezayê diparêzin. Belê mirov nikare ji bo mirov heman tiştî bibêje. Lewre ew gelek caran bi awayekî hovane êrîşî gelek heyberên xwezayê dike û wan ji holê radike. Ji bo gelek berjewendiyên xwe yên rojane, digel heyberên xwezayê hemcinsê xwe (mirovên din) ji holê radike. Ev liv û tevgerên hovane ahendariya xwezayê xira dike û ber û adaniya wê qels dike.

Ji ber ku mirov hem heyberê herî hişmend û kemilî yê xwezayê û hem jî wekî hemû heyberên jîndar yên din, parçeyekî xwezayê ye, neçar e ku pêşî ew xwezayê biparêze. Parastina xwezayê berpîrsiyariyê hevpar a mirovî ye. Tenê mirovî. Ango tu berpîrsiyariya heyberên din (ajal û lewirên dirinde û hwd.) nîne ku bikaribin xwezayê biparêzin. Lewre parastina wan jî dîsa ayidê mirov e. Û pêdiviya hemû heyberan bi parastina mirov a xwezayê heye.

Mirov û mirovahiyê heta niha ew peywir û binbariya xwe ya xwezayî û gerdûnî bi cih neaniye. Berevajî wê xweza û heyberên xwezayê texrîb kiriye û ji xwezaya wan bi

dûr xistiye. Şer û pevçûnên navbera mirovan digel komkuji û qirkirina gelek heyberan ahendariya rê û rêbazêbn xwezayê jî felîşandiyê. Ji do heta îro alav û amrazên şer û çek û amûrên kîmyewî xisarên pir mezin dane xwezayê. Ew alavên tundwar û kujende, tenê ne mirov, hemû giyanewer û heyberên jîndar ên cure bi cure ji holê rokirine.

Daxwaza desthilatdariya mirovan a li hemberî hevdu ji do heta îro bênavber domiyayê û hê jî didome. Û ev daxwaza jî her gav bi kuştin û ji holêrakinên yekalî û dualî bi dawî bûye. Di encama wan şer û pevçûnan de tiştê ku herî xisar dîtiye jî dîsa xweza ye. Digel ku jêşûdwergirtina xwezayê û parastina wê peywira mirov a asayî be jî, mirov ev peywira xwe pêk neaniye. Û ji bo wê jî bi awayekî rastîn (bi gelemperî) tu cehd û hewdan ne daye.

Teqez li ser rûyê dinê gelek kesên xwezahêz û hawirparêz hene. Ew ji bo parastina xwezayê û ahendariya gerdûnî ji dil û can hewl didin û dixebitin. Belê li aliyê din şer û pevçûnên bêyom û bênavber derfetê nadin ku ev xebat û hewldan bi awayekî erênî bi encam bibin. Ji ber ku teknolojiya îroyîn û alavên hilberînê di bin sîwana desthilatdariyê de têne xebitandin, ew xebatên birûmet zêde deng venadin.


Parastina xwezayê ne ayidê tu çîn, netew, zayend û olê ye. Ew berpîrsiyariyê gerdûnî ya hevpar e. Û tevê mirovahiya cîhanê ya do, îro û sibê binbar û têkildar dike. Parastina xwezayê pêdiviyêke îroyîn a dîrokî ye. Heke ji îro bi şûn de xweza bi awayekî gelemperî neyê parastin, dê mirovahiya dinê bi gelek xetereyên gerdûnî rûbirû bimîne.

Êdî mirovahî wekî malbateke giran bi serjimara xwe ya xilbe (heft mîlyar mirov) di hundirê keştiyêke mezin de di nava omaneke (deryaya mezin) bêser û ber de nok dibe. Hemû endamên vê malbatê, wekî rêwiyên vê keştiyê neçar in ku bi qasî hevdu bi pejnkarî û hestyarî tevbigerin. Û vê keştiyê reha bikin û li bejariya jiyane (rawestgeha wê) bidedînin.

Kaniya Helbestan

Şeva Tarî

Hisên Abbas
h.garbi@web.de



Şeveke reş û tarî,
Baran ji erd û ezman dibarî
Seyê pîr li ber derî
Çav li xew ne direyî
Mîya sitewr ne dimarî

Vizeviza bayê cemidî
Dihat ji sefirnên xanî
Dengê zûrezûra gurên birçî
Dihat ji alyên jorî
Şewqa birûskan dida xênî

Reqereqa ewrên tarî
Bizinên şil li dor nêrî
Qîjeqijên qazên sipî
Ji dûr dihat dengê tortorîkî
Lê vedigerand sekî birçî

Pîrebîk û heft sêwî
Maleka biçûk li kevîya gundekî
Gundekî dûr bû li ser mitikî
Sopeke tepikî bê rimî
Şikestî û qûl bû ew derî

Ne semyan û ne xwedî
Diketin Derya bêbinî
Diketin xewa bê dawî
Didîtin xewnên bêhêvî
Mîna xewnên şevê dî

Jînenîgariya Aramê Dîkran

* 1934 - 2009*



Konê Reş- Qamişlo

Buhiştî **Aramê Dîkran** di 15.01.1934'an de li Qamişlo ji dayîk bûye. Ew bi xwe kurê **Dîkranê Sakoyê Mêlo**

ye (Navê wî di nasnameya wî a Sûriyê de wiha ye; **Aram Serkîs Mîlîk**). Bi eslê xwe ji Ermeniyên herêma Farqînê ye. Bapîrê wî **Sakoyê Mêlo**, berî fermanê mixtarê gundê xwe bû. Ew gundê bi navê **Biebda**, li navça **Pasûrê**, ji herêma **Farqînê**. Di fermanê de bapîrê Aram, Sakoyê Mêlo tê kuştin, bavê wî Dîkranê Sakoyê Mêlo, xwe di nav kurdan de vedişêre, kurd wî diparêzin û wiha jiyana xwe li Farqînê û Diyarbekirê derbas dike ta ku di destpêka salên sîhî de li **Qamişlo** cîwar dibe. Di sala 1966'an de ji Qamişlo diçe Ermenistanê, li gundê **Apovyan** cîwar dibin. Li Ermenisanê, Aram çend salan di radyoya beşê Kurdî ya Yêrîvanê de wek karmend kar dike.

Dîkranê Sakoyê Mêlo, li Diyarbekirê dizewice û keça wî a mezin **Baytzar** li wir çêdibe (Temenê wê di ser 80 salî re ye, hêj sax e, mala wê li Brukselê ye û kurê wê Ewadîs hunermendekî zîrek e). Zarokên wî yê din tev li Qamişlo çêdibin. **Aram** di sala 1934'an de, **Kîvork** di sala 1937'an de (Berî çend salan li Beljîka koça dawî kiriye), **Serkîs** di sala 1940î de (Hêj sax e, li bajarê Qamişlo dimîne, dema ku malbata Dîkranê Sakoyê Mêlo di sala 1966'an de çû Ermenistanê, bi tenê kurê wî Serkîs li Qamişlo ma. Hingî bavê wî bêriya wî dikir, ev gotin ji Aram re nivîsîn û Aram kir stran: **Çima nayê ez wî bibînim... Rêka min dûr e, çavê min wî nabîni..**), **Hayîk** di sala 1943'an de (niha li Holanda dimîne), **Zavînar** keça wî a herî biçûk e, ew jî li Qamişlo çêbûye û niha li Beljîka ye.

Dîkranê Sakoyê Mêlo (Bavê Aram) û seydayê **Cegerxwîn** dostên hev yê nêzik bûn. Gelek caran

Cegerxwîn xwe di mala wan de vedişart... Aram ji biçûkaniya xwe ve hez lêdana amûrên muzîkê wek tembûr û cimbişê dikir. Ango di 15 saliya xwe de wek tembûrvanekî ermenî ku bi kurdî, ermenî û siryanî distrê û di nav xelkên Qamişlo de dihat naskirin. Di rêka bavê wî re, dostaniya wî bi seydayê Cegerxwîn re çêbû û helbestên wî kirin stran... Hêjayî gotinê ye ku gelek gotinên stranên Aram yê bavê wî bixwe ne. Wî di hunermendiya xwe a dor 50 salî de, bi kurdî, ermenî, erebî, siryanî, yûnanî û tirkî stran gotine. Belê zêdetir bi kurdî stra ye û wek hunermendekî kurd hatiye naskirin. Aramê Dîkran, di salên xwe yê dawî de, jiyana xwe li Atînayê, paytextê Yûnanistanê derbas dikir. Ta ku di roja 06.08.2009'an de, ji ber xwînberbûna ser mejiyê wî, ket nexweşxaneyek Atînayê de û di sibeha 08ê Tebaxa 2009' de, jiyana xwe ji dest da. Belê sed mixabin rayedarên Tirkîyeyê destûr nedan ku li Amedê bê veşartin wek ku wî dixwest... Li ser vê yekê malbata wî biryar dan ku termê wî li Brukselê

veşêrin. Lewra di roja duşem, 17ê Tebaxa 2009'an, piştî merasimeke jêhatî, ew di Goristana Jette de a di taxa "Boulevard de Smet de Naeyer" veşêrin. Hêjayî gotinê ku Şaredarê Bajarê mezin ê Amedê Osman Baydemîr ji bo beşdarbûna termê Aramê Dîkran û xwesteka wî, çûbû Brukselê û hin axa Amedê bi xwe re bir û li ser gora wî reşand. Sê zarokên wî



hene, du keç bi navê; **Eyçîmîk** û **Sîvan** û kurek bi navê **Agob**. Ta roja îro birayê wî Serkîsê Dîkran (Bi navê Bavê Dîko tê nas kirin) û bi zarokên xwe li Qamişlo dimînin. Bav û diya wî di salên heftêyan de li Ermenistanê koça dawî kirine. Yezdanê gewre tevan bi dilovaniya xwe şad bike. Bela serê gelê Ermen û Kurd sax be.

* Min ev nivîs bi alîkariya Serkîsê Dîkran, birayê Aramê Dîkran yê ku li Qamişlo maye berhev kiriye.



Xebatên Kurdolojî ên Celadet Alî Bedirxan:

Kurd û Welatê Wan Kurdistan

► Berhemên Giştî ên Celadet Alî Bedirxan vê carê bi lêkolîneke kurdolojî didome: **Kurd û Welatê Wan Kurdistan**.

Her xwendinek an jî lêgerînek di nav rûpelên Hawarê de fikr û dîtinên nû dide mirov. Ev berhema di destê we de jî encama yek ji van xwendin û lêgerînan e. Ev berhevok aliyekî din ê Hawar / Celadet Alî Bedirxan derdixe ber çavan: **Xebatên kurdolojî**.

Celadet Alî Bedirxan, di nivîsa destpêka kitêbê de wiha dibêje:

"Belê xorto xwe binas, lê ne ser pelekî, xwe qenc, bi dehkere û bingeh binas.

Heyîna te, heyîna milletê te, tenê bi hatin nasînê têtê pê. Hetanî ku tu meyî naskirin, xwe medî nasîn, di nav koma milletan de cihê te nîne.

Ev kitêboka ha ji bona vê yekê hatiye nivîsandin. Belê armanca wê ev e: Te ji te re dane naskirin.

Xorto! Tu çilê milletekî kevn, nîjadekî mezin î. Pêşiyên te di rûpelên dîrokê, di gorinên gernas û camêran de raketî ne. Tu kurrê kurdan, neviyê medan, dahatiyê ariyan î...

Dîsan nizanin ku kurd ne avzê in, kanî ne. Bi dagirtina çem û rûbar bête girtin jî serê kaniyê nayê. Ew dizê û di ber bendan de dipingire, rojekê li wan têtê hev di ser wan re diherike û wan di bin pêlên xwe de hildiweşîne.

Xorto! Holê bixebite, an bixwe çêke an arîkariya ewan bike ku çêdikin, ava dikin.

Keçê! Di van gotinan de para te ne hindik e. Keçê! Tu keça wî camêrî, jina wî mirovî, diya wî xortî yî ku min şîretan lê kir û kar û xebata wî şanî wî da. Belê keçê, ev xortê ha xortê te ye...

Keçê! Min ji te divêt, tu xortê min welê bixwedî bikî û bigihîni ku li pesn û şabaşan seza bit û lome jê mebit. Keçê! Tu di herkar û deravî de arîkara xortê min î. Tu ê pê re bijî, pê re jî bimirî".


Celadet Alî Bedirxan

Di sala 1893'an de li Stenbolê hatiye dinyayê. Neviyê Mîr Bedirxan Paşa ye.

Dibistana yekemîn û a navîn li Stenbolê xwend. Di Şerê Cîhanê ê Yekemîn de di nav Artêşa Osmanî de li Eniya Kafkas bû. Piştî ku Împaratoriya Osmanî hilweşiya, ji bo yekîtiya eşîrên kurd pêk bîne xebitî, lê bi ser neket. Di sala 1922'an de tevî birayê xwe Kamiran Alî Bedirxan çû Almanya û li wir xwendina xwe domand. Di 1925'an de derbasî Rojhilata Navîn bû, piştî demekê li Qahîrê ma çû Sûrî û li wir bi cih bû. Li binxetê bi Haco Axa û ronakbîrên din ên kurd re Xoybûn ava kirin. Di salên 30'an de dest bi xebatên kulturî kir. Berpirsiyar û xwediyê kovara *Hawar* û

Kurd û Welatê Wan Kurdistan

Celadet Alî Bedirxan



Ronahî bû. Elfaba kurdî bi latînî çêkir. Li ser gramera kurdî xebatên gelekî girîng kirin. Celadet Alî Bedirxan, di 15ê Tîrmeha 1951'ê de li Şamê çû ser dîlovanîya xwe.

RÊZA CELADET ALÎ BEDIRXAN
- Günlük Notlar (Amadekar: Malmîsanîj, bi tirkî)

- De La Question Kurde / Kürt Sorunu Üzerine (Bi frensî û tirkî)
- Were Dotmam (Şîrên Hawarê)

- Kürtçe Gramer (tevî Roger Lescot, bi tirkî)

- Edirne Sukûtunun İç Yüzü (tevî Kamiran Bedirxan, bi osmanî)

Kurd û Welatê Wan Kurdistan
Celadet Alî Bedirxan
Weşanxaneyê Avesta ji Agirî re sandiye

Nemir

Şikestî



Şahîn şah û sofia
Van kafir û bêjiya
Li rojên tenk û tariya
Em kuştin li xerîbiya
Diva bikujin hêviya
Dil birijî û Çav girya

Di mal û derve em kuştin
Napalim li warê mi avêştin
Em di bêjarê de hiştin
Erê ku kurd bê piştin
Li ser Qasimlo xwe kuştin
Wextê şêrê min kuştin

Hêvî kuştin di jînê
Partîya Sûrî te dihebînê
Lê Qamişloka evînê
Xwe di kête reş û şînê
Xwîn di dê ser birînê
Qasimlo bû rahê xwînê

Şêr Ebdilrehman Qasimlo
Diva şev li me bikê ro
Şêrê mi kuştin Çima bo
Ma qey xudê wiha ko
Wê azadî werê ro
Bi keda kurda û Qasimlo

Şikestî bejnê diçimînim
Hêvî bi keda we tînim
Wê aza bê Kurdistan
bi kar û berxwedan
bi kar û berxwedan

Gera Sêyem Ya Parlemana Kurdistanê Dest Pê Kir

► Roja pêncşem, 20'ê Tebaxa 2009'an, rûniştina yekem a gera sêyem a Parlemana Kurdistanê li Hewlêra Paytexta Herêma Kurdistanê dest pê kir û piştî sondxwarina endamên nû yên Parlemana Kurdistanê, **Kemal Kerkûkî** wek Serok, **Erselan Bayiz** wek Cîgirê Serok û **Firset Ehmed** jî wek Sekreterê Parlemana



Kurdistanê hatin destnîşankirin.

Herwiha Serokê Herêma Kurdistanê, Mesûd Barzanî jî sonda qanûnî xwar û gotarek balkêş li ser rojeva siyasi ya Herêma Kurdistan, Îraq û devera Rojhilata Navîn pêşkê kir. Li gor agahiyên nûçeyan, biryar e di vê hefteyê de Serokê Herêma Kurdistanê, **Dr. Berhem Salih** rasipêre bo pêkanîna kabîneya nû ya Hikûmeta Herêma Kurdistanê.

Bo Cara Çaremîn, Angela Merkel Bû Jina Herî Bihêz A Cîhanê

► Serok Wezîra Almanyana, Angela Merkela 55 salî di nav lîsta sed jinên bihêz ên cîhanê de pileya yekem bidest xist û bo cara çaremîn weke jina herî bihêz hat diyarîkirin. Lîsta bihêztirîn jinên cîhanê di Kovara Forbes a Amerîkî e hate belavkirin.

**Forbes
Woman**



Sedeama hilbijatîna Merkelê weke jina herî

bihêz ya cîhanê bo cara çaremîn, vedigere bo rêveberiya wê di berpirsariya Serok Wezîriya Almanyayê û ew çaksazî û reformên civakî û aborî ku Merkelê di civaka Almanyayê de pêk aniyê.

Senar Mamedî Endamekî Kevnar Yê PDKÎ Çû Ser Dilovaniya Xwe

► Agiri: Roja 25ê Tebaxa 2009'an, li bajarê Stokholm a welatê Swêdê, endamekê kevnar yê PDKÎ bi navê Senar Mamedî çû ser dilovaniya xwe. Senar Mamedî jî salên beriya serkevtina şorişa gelên Îranê di sala 1979'an di refa xebatkarên PDKÎ de xebat kiriye û di çend



dewran de endamê rêberiya PDKÎ bûye. Senar Mamedî bi sedema xebat û tekoşinê çend caran ji aliyê her du rejîmê dîktator ên Pehlewî û Komara Îslamî ya Îranê hatibû zîndanîkirin.

Bi hîkevta koça dawî ya Senar Mamedî, PDKÎ behî û serexweşiya xwe pêşkêşî malbat û kes û karên wî dike û xwe di xem û kovana ji dest çûna Senar Mamedî de şîrîk û hexem dizane.

Almanya Daxwaza Dorpêçên Li Ser Beşa Enerjî Ya Îranê Dike

► Almanya dibêje ger gotûbêjên grûpa 5 + 1 bi Îranê re negihîjin tu encamekê, divê ew girûp dorpêçên tudn û berfirehtir li dijî Îranê rêve bibe.



Em dixwazin ku beşa vejena (enerjî) Îranê bikeve ber dorpêçên civaka navneteweyî. Serok Wezîra Almanyana, Angela Merkel di hevpeyvînekê de bi Rojanmeya Frankfurt Almaniya re diyar kir, eger gotûbêjên me bi Îranê re serneketin, divê baykut û dorpêçên beşa enerjîya Îranê bibe armanca grûpa 5 + 1, bi taybet şandin û firotina Benzînê bo Îranê.

Ev helwêsta Angela Merkel di demekê de ye ku dema çend salan e çendî welatên Ewropa û grûpa 5 + 1 bi cuda li ser programa Etomî ya wî welatî re digel Îranê gotûbêjan dikin, lê heta niha wan tu encamek erênî negirtiye û Îranê tenê bi hêceta diyalogê demkê dikuje û dikire, heta ku bernameya zengînkirina Uraniyûmê pêşde bibe û bikare bombeyên Etomî çê bike.